



Qado Şêrîn

Biratiya kurdan qediya

Biratî ax biratî, tu li ku tê kirîn û firotin? Van rojan biratî tê keritandin, gelek caran hatiye bînpê kirin, hestê netewî tê qurmiçandin, û roj li dûv rojê biratiya kurd ji kurd re kêmbê, wek hestiyê bê kevjandî û rût bibe. Her wiha li şûna wî hestê xweşik ku me nav lê dikir” hestê netewî” hestê serok û berjewendiyên partîyan, tîn danîn.

Biratiya kurdan ji hev re ketiye tûrikê berjewendiyên, berjewendiyên kesane, berjewendiyên partî û serokan. Sofitî û koletiya ji serokê partîyan re şûna biratiya kurd ji kurd re girtiye. Silogana “Kurd birayê hev in” bê wate û li gor berjewendiyên demikî û xapînok tê bikaranîn.

Biratî nemaye, li şûna biratiyê berjewendiyên cihê xwe xweş kiriye.

Ne kurd tenê wiha ne, lê ji ber em bê welat in, û pêşeroja me nediyar e, êdî gerek bû biratiya me nehata keritandin, û birakujî û nimûneyên din pêk nehatana.

Ji 15ê adara 2011an ve şoreşa Sûrî li dijî rêjîma Esed berdewam e, di rojên dawî de tê diyar kirin ku rêjîm êdî siyaseta birçîbûnê li dijî gelê Sûriyeyê bi gîştî pêk tîne, daku xelkê bi peyda kirina nan û şîrê zarokan mijûl bike, û ji ber wê gelek caran firokeyên rêjîmê yên şer li firneyên nan dan.

Qure-qura zikê kurdan e ji birçîna, cilên xwe dişewitînin daku xwe li ber germ bikin. Û ji ber wê hawar û gazina xwe birin birayên bakur û başûr.

Wexta Israîlê li Geza da, li hin deveran kurdên bakur ji bo birayên misulman daketin kolanan û li dijî Israîlê meşîyan. Em kurdên rojava jî wê piştgirî û alîkariya siyasî dixwazin, ta ana ji bo me meş û xwepêşandaneke pêk nemeşîyan e. Mixabin ta ana mercên biratiyê pêk neanîne û diyar nekirne ku em birayên hev in û zikê me li ser hev diêşe.

Kurdên bakur mîna yên başûr nikarin alîkariya madî û siyasî bidin, lê ku bixwazin dikarin nanê germ û şîrê zarokan ji Nisêbînê bighînin Qamişlo û bajar û bajarokên din.

Eger kurdên Nisêbînê di ser tîlan re nan bavêjin, wê germ bighê navenda Qamişlo, ta ana ew alîkarî nebûye. Me nediyê rêxistinên wan ên sîvîl alîkarî ji bo birayên xwe li Rojava dane hev, û ne jî ji bo wan bi çalakiyek siyasî rabûne.

Erdogan, dijminê kurdan ê nemre yek sînore xwe bi herêmên kurdan re asê kiriye, em wê bihaneyê dizanin û ji ber wê kurdên bakur nikarin alîkariya madî bi kurdên xwe re bikin, lê ku bixwazin dîsa bi gelek şeweyan dikarin. Eger hûn nikarin nan û şîrê zarokan bighînin, alîkariya siyasî bikin, li dijî Erdogan û pirojeyên wî yên li dijî kurdên Rojava bimeşin.

Erdogan çeteyan ji bakur derbasî Serê Kanyê dike, daku şerê pyd bikin (wek ku pyd dibêje), cuwamêrekî ev yek bawer nekir û bi tinazî wiha di facebooka xwe de nivîsand: Ez bawer nakim Erdogan karibe di nav 20 milyon kurd re çeteyan ji bakur derbasî Serê Kanyê bike, çimkî 20 milyon kurd dê nehêlin çete di nav wan re biçin kurdên aliyê din bikujin.

Me jî gilî û gazinên xwe bi riya rûpela xwe ya facebookê gihandin birayên xwe (eger em hîna birayê hev bin), piştî em gihan wê baweriyê ku kurd nema wek berê dikarin bêjin: **Rûpel (19)**

Boniye Cegerxwin

Biyanî me digerin



Ne koçerim , koçberim
Biyanî me digerin

Li kolanan diçim tê m
Bi çav wînda dinerim

Dixwazim min bi nasin
Mebesta xwe darêjîm

Divê giştîk bizan in
Çima bê war û berim

Guneh, reben bê xwedan
Sitûxwar û keserim

Dixwazim nav û nîşan
Wekî teva rê herim

Bi serbest û azadî
Wekî mirhov bi xurim

Bi qoral û qiralim
Li yasa hem guhdarim

Di zanîm wê roj werê
Ji lew pêt û pêdarim

Bi pêşengî , pêşketin
Li pêla wê siwarim

Kurdek zana pa bilind
Xwedan bajar û şarim

..... **Rûpel (9)**

Arşek Baravî

Hêviya zuha



Min digot ,te digot.. û her kesî jî ji me re digotin.

.gencîne û kogehên bêyî pîver û bê hempa ..

ji pêkanîna hêviyan re li wir hene.

Me navên derew û ne şayist li xwe dikirin, me xwe kir mîdyakar û me zanî bû em ne evin, me xwe kir rewşenbîr û me ji xwe dipirsî.. ma ji ku em evin.. em nerast dibêjin? Tenê em pêrgî wê bûne, tew me xwe dikir wêjevan jî..lê em pê ne qayil bûn, çiku me xwe ne ew gişt didît, hema me ew navên qube li xe dikirin û ew barên giran hilgirtin, me di dilên xwe de digot .. em çi bêbext û telaqreşin.

Tev de ji boy ku em ji ava kaniyên kewarên hêviyê têr vexun, me pîrr helwest bînpêl kirin û ten gavî derbas kirin.. û kêmasî jî dîtî, berê me li hêviya bêreng bû, berî me jî karwan hebûn û hêvîfiroşan bazirganî bi me û wan kirin.

Em gihîştin warê hêviyê, me qencyên kevna di guhên hev de xwendin, me xwestek bi xwarinên xweş re li ser mêzeyên mêvandariyê radixistin û li wir ji bîr dibûn, li Motêlên çar pênc stêrkî ku ji xwîna goriyên dozê ava bûbûn.. çavên me sêrik û waj diman, weke miriyê ku serê wî li kevirê gorrê keve, em hên nûh bi xwe hay dibûn.

Bi zikên têrxwarin û çavên têr xew.. em li hev dicivîyan û me diranên fîq bi gazinan li hev disotin, di bîra min debû ku gelê min rênerîne dike, gelo çi çê bû .. ka me çi kir..? Lê min bi mebest bi derengî bersiv da, da ku hinekî kela gelê min bifûre û henaseke kûr ji kesera hêviya zuha bistîne, heye ku karibe li min guhdar bibe û ji min bawer bike.

Em li nav hezkerên xwe bi nav û deng in.. lê li nav ziktêrên kêsbaz û çavbirçî.. em pawan dibûn, em dihatin dizîn, kî welatparêz be divê here serdana ewê gorra pîroz.. an jî ew ne raste.. gelo ev bû hêvî?

Bi çavên kêmbê li me dinêrin, em sêwiyên wan bûn .. û şeş qewîtî û tembî û şîret li me kirin, ev encama dîdarê bû, erê şeş mercên ku pêk neyên ji me re kirin bar, ên berya me jî ew bûn.. lê çewt û xwar û leç û vêl ji me re digotin.

Bi gerrê çavên me vekirin û em dîsan û li wir **Rûpel (19)**

Bêwar Barî Teyfûrî

bewar@inbox.ru

Rastiya me eve

Bê rastî pêşeroj tarî ne dîyar,

Nayê pejirandin her wext nabe par,

Ji bo gelê nezan yek jî yên hejar,

Rastî xîyalanda zindîye hercar.



Her kes pêwîste resen û keseyyata xwera xwedî derkeve, çi rewşêda dibe bila bibe peywardare, deyndare wê biparêze.

Kesên ku nikarin resen û keseyyata xwe biparêzin yê welat û netewa xwe çawa biparêzin an jî temsîl bikin.

Mirovên têngêhîştî û bi sîyanet tu dem naşkên lewra xwedan keseyat û resenin. Gel, cîvak hertim ji bo pêşerojê hewceyî keseyatên têngêhîştîye, lewra qedera xwe dispêre wan.

Gelê nezan bê perwerde bê rêk û pêke, nuxsê demê bêkenîyê dîrokêye. Hertim qismetê wî koletî û rûşîye. Li bin bandoranda jîyaneke erzan û qirêj, dijwar didomîne, dîlê cîvakane (gelane), koleyê dîrokêne.

Gelê nezan kevneşop û bê fehme, pêşê wî, karê wî muxenetîye. Ji muxenetîyê jî îxaneteke bê hempa ne wekilandî, xedarî pêşda tê. Mirovên ji demê paşda mayî derbê giran û xedar li hevdu dixin. Bi giştî jîyaneke bê wete, emrekî rezîl derbaz dîkin, li ser toreyên kevn, klasîk radiwestin (kevneşopî, tayferestî, êlperestî, qewmperestî, tolhildan, kîn, dujmintayî, olperestî, hev begemnekirin), pêşeroj çî tişte nafikirin, jîyana rojane a erzan ra, bê weta ra zû qaîl dibin. Ji bo jîyaneke sivik, wedelî ra her tiştîra amadene, îxanetê ra jî.

Îxanet dojecha sîyanetêye, vemirandina, tunekirina wîcdan û azayêye. Cîyê ku lê wîcdan, sîyanet tune îxanet ser dikeve. Cîvaka ku lê îxanet hakîme nîrxên mirovahîyê tînen qerisandin û fetisandin. Îxanet kujerê (celadê) mirovên bi wîcdan bi şeref û têngêhîştîne. Ên ku îxanetê di nava xweda qebûl dîkin ên nezan û kotîne. Ên şareza, maqûl û bi şeref zane tu dem îxanetê ne ku qebûl nakin, hertim dijî wê dimeşin.

Gelê nezan, cîvaka nezan hertim ji jîyana serkeftî serfiraz a bi rûmet, bi wate, bi rêz mehrûme, lewra kund û berdeste, ev, rewş mecalê nade ser keve, rewşeke xirab hemêz dike bi îxanetê nefesê destine, ji hestên netewî û ji hest û nîrxên mirovahîyê gellekî dîr ketîye, lewma jî hertim mehkûmê tunekirinêye, demêra nîkare bimeşe bê hêz û bê taqete nav îxaneta giştîda dihele, pêşeroja nezan û xizana tune, pêşeroj çîye dereqa vê yekêda ne raman dîkin ne jî hewil didin xwe bugehirin, rewşê bugehirin. Îxaneta netewî pêşeroja gelan dukuje. Îxanet him jî yekbûna gelan ra tehlûkeye. Yên nezan zû-zû hevdu îxanetê dîkin, lê kund, bêkenî û bindestê gelanin. Qe hevdu fehm nakin, ne jî hevdu qebul nakin (napejirîn).

Gelê têngêhîştî zane, xwendî, bisavad pêşda dimeşe, her dem serbilind û azade, kubar û dilşade, bindestîyê qebûl nake sîyaneta gelêrî, resenê tu tiştîra naguhere, jîna bi rûmet hesdike. Koletîyêda rûmet û rêz mirîye. Gelê kole mirîyê zindîye.

Herêma meda cîvaka kurd jîyaneke bê rûmet û bê rêk û pêk didomîne. Vê cîvakêda bi demane îxanet hakîmîyê dike. Nezanetî bûye bela sere vî gelî, hevdu qebûl nekirin bûye nexaştî û derd ji bo mirovên kurd. Nava hevda her yek zane û serokeke. Weha heya dawîyê jîne nabe. An gerek bibî xelqperest li bin tesîranda bijî û bihelî, an jî gerek dijî nezanetîyê, koletîyê, îxanetê berxwedana giştî ava bikî.

Bo xatirê jîyana azad û pêşerojê zarokên xwe bi ruhê netewî, bi nîrxên netewî, bi zimanê dayîkê, bi dîrok û wêjeya netewî, bi dibistana netewî ku gel zarokên xwe perwerde bike yê ese jîyanêda ser keve û bibe xwedanê qedera xwe, bibe xwedanê pêşerojê. Pêşeroja gelan ji zarokên wan dest pêdive. Zarok temsîlvan û îfadekarê pêşeroja cîvak û gelanin.

Her mirov ê zane têngêhîştî bi resen ber dîrok, cîvak û mirovahîyê, li ber neteweyê deyndar û peywardare ku kar û xebatê bike. Ev berpirsîyarîya (mesûlyeta) bi şeref a lazim (pêwîst) îro dikeve li ser her mirovî yê ku xwe rastî jî kurd dihesbîne. Dem hat gêhîşt. Pêşeroja xwe em bi hev ra ava bikin, em ji hevra xwedî derkevin, rê nedin îxanetê, hevdu ra bibin teyax.

Em hîmê, bîngeha pêşeroja bi rûmet li ser zanebûnê bi zanyarî berqerar bikin. Bila nîşen me yên hatî bi serbilindî, bi rûmet, bi sîyanet demêra bi zanetî bimeşin. Azad û serfiraz û jîr bijîn. Azadî îro zanebûnêva tê pivandinê, girêdayî yekbûnêye. Mirovên zane jîr û bi cesaretin. Cesaret jî koletîyê hesnake (qebul nake). Bê rastî pêşeroj tarî dimîne. Rastîya me, rewşa me duruma me eve.

Belê dibistana netewî zemîna perwerda bi rêk û pêke, rewşa gela duguhêre. Bê dibistana netewî, bê perwerda netewî gel nagêhije, têngêhîştîye, ruhê xelqperestîyêda tê perwerde kirin, ji ruhê netewî mehrûme, jîyanêda dikule. Zanebûna netewî yekbûna netewîra bi bawerî rê vedike. Yekbûn jî wesîla jîyana bi rûmet a azade.

Belê, erê ji bo ku gel têbigêhije jêra ese perwerdeya neteweyî pêwîste gelê kurd ji perwerdeya netewî mehrûm maye, lema jî bi sed salane têngêhîştîye, tê xapandin kevneşopîyêda tê vemirandin û rizandin. Bi demane li ser kevneşopîya klasîk biryar girtîye

ji nûjenbûne, ji moderbûnê paşda (şunda) dimîne.

Gel dibistana netewîva, çapamenîya netewîva tê perwerde kirin û gîhandin. Gelê weha têngêhîştîye demêda tê pejirandin.

Tunebûna ruhê netewî hertim ji gel ra kêmasîya pêşda tîne, bobelata ra rê vedike. Ruhê netewî heja hundir (batîn) ê mirovane, heja mejîyê mirovane, mirov û gel hişîyar dike, jîyana bi rûmet ra digîhîne. Mixabin gelê kurdda ev ruh dereng hişîyar bû. Tunebûna ruhê netewî xwe nasnekirin û hevdu

qebûl nekirine, xwe nasnekirin jî koletîyêda undabûne.

Mirov, gel ku xwe nasnake nikare xwe ji zulm-zorê, ji bandoran, ji bobelata, ji êrîşa biparêze, hêdî-hêdî berbi helandinêva dice, tu wext nikare xwe îfade bike.


Ruhê netewî zemîna yekbuna mirovan û gelane. Gelê xwe nasdike ê yekbuyî tu dem têngêhîştîye, bi hêze û jirê. Me kurda ra ev hesta pîroz îro wek av û hewayê pêwîste, ji bo ku em serbest û bi sîyanet jîyana xwe bugeherin. Xwe naskirin serkeftine.

Ruhê netewî jî hestek evraye, ev rastîya jîyana bi rumete. Em peywardarin jîyana bi rûmet azad ra xwedî derkevin.

Ji nezanetîyê dîr kevin, koletîyê, xelqperestîyê qebûl nekin. A eve rastîya me.

Peywira (wezîfa) me – em xwe gorî demê bugehirin bi zanebin, nîrxên xwe netewîvra xwedî derkevin, zarokên xwe pêşerojê serbestra amade bikin, bivine layiqî jîyaneke bi wate, balkêş û bi rûmet.

Gel beqî lawên xwe ên zane, têngêhîştî, bi şeref û mîrxas pêjda dimeşe digêhije qadên tewrebilind, xwe nasdike û xwe dide naskirin, her



Feqî Kurdan (Dr. Ehmed Xelîl)
dralkhalil@hotmail.com

Deh tembî ji bo ramyarên kurd Tembiya (9) - (Beşê 2)

Haj Çêkirina Serokê Dîktator Hebin!



Serokatî û Diktatorî:

Sê hêmanan pirsgirêka Serokatîyê di civata kurdî de peyda kir; ewan jî even: Hizra ramyarî, seykoliciya çiyar, û dagîrkerî; evan her sê hêmanan, hêşt her kurdek xwe bibîne ku ewa seroke, û qet bi dilvehesî xwe naxe bin sîwana serokekî kurd.

Li ber ronahiya vê pirsgirêkê mirov dikare sedemên pîrbûna dijhevî, nokerî û xiniziyê bipelîne, û bizanibe ji bo çi jimareke ne hindik ji kurdan dipejîrînin ku serokekî biyanî serdarê wan be, ji dêvla serokekî kurd.

Ey ramyarên me yê rêzdar, hûn dizanin ku pirsgirêka me ya bingehî- ji 25 sedsalan de- ne çînî ye an olî ye an deverî ye, pirsgirêka me ya bingehî parztina hebûna me ye, çunkê dagîrker bi her awayî rê li pêş hebûna me ya neteweyî digrin, naxwazin bizanibin ku kurdistan welatê me ye, lewre, eger ku em dijheviyên çînî an olî an deverî di nav civata xwe de gurr bikin, em yardimiyê girîng pêşkêşî wan dikin, lê mixabin em ta niha bi vê yardimiyê radibin, û em dihêlin ku dagîrker li me siwarbin, û me ji bo bercewendiyên xwe bi kar bînin.

Ey ramyarên rêzdar, rewşa me pêwîst dike ku (berxwedana ji bo hebûnê) bawerîya me be, an jî em gona xwe bi destên xwe dikolin, bingehên mîrnîşanên dijhev datînin, ew mîrnîşanên ku qet ê nikaribin li hember pirojeyên dagîrkeran rawestin, helbet ew mîrnîşanên ku di sedsala (11z) de hatinî rûxandin li hemer êrişên sulcoqiyar nemûneyeke berçave di va çarçewê de.

Lewre, pêwîste em parztina partiyar û serokan nexin pêş parztina hebûna me ya neteweyî, heger ku bikevî va şaşîtiyê, emê wek êlên Liwîzyana bin, „çaxa ku dixwaztin berhemekê ji darekê bi destxwaxînin, dar ji kokê de dibirîn“ (Montiskiyo: Ganon Zagonan, rû 91).

Erê, parztina hebûna me ya neteweyî pêwîst dike ku em di xendeka neteweyî de cîh xwe bigrin, û di bin destê serokatîyê ya hêja û jêhat de bicivin, û pêwîste serokek sedarê eva serokatîyê be. Lê em ji bîra nekin ku hizra kurdî desthilatdariya avend û serokê dîktator napejîrîne, bi taybetî jî eger ew seroka kurd be, gelo emê çawa vê pirsgirêkê ji hev biderxînin?

1 – Pêwîstiya hebûna tek serokatîyêkê û tek serokekî.

2 – Nepejîrandina serokê dîktator û desthilatdariya bêsînor.

Werin em sûtê ji dîroka pêşiyên xwe bigrin, li dirêjahiya dîroka me, rêbaza (Kon Gir) rêbaza herî baştir bû, serokê ko guh nedida eva rêbazê ziyarên giran bi serê gelê me de tanî, û dibû sedema hilweşandina dewletê, wek nemûne: çaxa şahê medan ê dawî (Estiyag kurê Xesro) pêşengên medan dan yalîkî, û bû şahêkî dîktator, ew pêşengan bûn alîkarê Korşê Duwem, û şahnişîna medan xistin destên farisan sala (550 b.z), bi serda jî em karin bibêjin ku pirsgirêka (serokê dîktator) hêşt ku şahnişîna Eyyûbiyan sala (1250 z) ji dest kurdan biderkeve, û têkeve destên Ebebozên tirk.

Rêbaza (Kon Gir):

Li ber ronahiya van rasteqînên dîrokê- xencî wan jî pîrin- tê xuyan ku rêbaza (Kon Gir), di çarçewa desthilatdariyê û serokatîya de- rêbaza herî baştîre, ji yalîkî de ew nahêle (serberdana serokatîyê) peyda bibe, û ji yalîyê din de, rê nade ku serokê kurd bib dîktator. ev rêbaza ta niha bi rengê (Kongirês) û rengê (Komîta rîsipîyan= مجلس شیوخ) li Ewropa û Emerika heye, bi kar anîn, lê pendyarên me berî wan bi kar anîbûn.

De werin em bipîrsin:

Gelo, emê çawa va dezgeha (Kon Gir) an (Kon Gel) avabikin?

Pêwîste em ji her gund û bajarekî de dest pêbikin, da ku em (Komîta Navçeyî) di her deverê de damezirînin, û pêde herin ta ku nûnerên evan Komîteyan Navçeyî di bin sîwana (Komîta Neteweyî ya Bilind) de) cihê xwe bigrin, di pêre ev Komîta Bilind ê karibe serokekî neteweyî ji nav xwe bipejîrîne, û sînoran dine da ko ew nebe serokekî dîktator.

Ramyarên me ên rêzdar, bi rastî ev ê pêkanîneke gelek girîng be, û bawer bikin ku emê karibin bi va rêyê hebûna xwe ya neteweyî biparêzin, û welatê xwe rêzgar bikin, erê bidestxistina va armancê ê ne bi hêsanî be, li em ji bîra nekin, eger vîneke neteweyî ya bi hêz hebe, û hişyariyê neteweyî ya fireh û dûrnêrîn cihê xwe di nav me de bigre, dijwarî ê bibe hêsanî, û ev armanc ê bi serî bibe.

Ramyarên me ên rêzdar, em ji bîra nîkin ku erka ewe ku em welatê xwe rêzgar bikin, dewleta xwe ava bikin, û em dizanin ku dewletên welatê me dagîkirine li dijî va erkê ne, û dizanin ku dewletên cîhanê ên gewre guh nadin berjewendiyên me.

Lewre, pêwîste em ji niha de bi kar û barên neteweyî rabin, hişyariya neteweyî ya hevbeş

pêkînin, nêrîna neteweyî ya hevbeş bi cih bînin, kesayetîya kurdistanî ya resen ava bikin, piroceyêke bi rêkûpêk damezirînin, eger ku em bi van kar û baran ranebînin, em ne bes çarenûsa pirsgirêka xwe ya neteweyî bi şondixînin, lê bi serde jî em **yardimiyê bi** dagîrkeran re dikin, da ku habûna me ya neteweyî bînpê bikin.

Gelo ma ev ne bêtareke bê hempa ye?!

Daxuyanî:

Ev gotara bi zimanê erebî hatibû weşandin.

Ehmed Mustefa

roj.ava2013@gmail.com



Nazik Şemalê

Nazîkê Gerden zerê

xweşikê reng esmerê

Şêrîn bejin ziravê

Hey nazîkê wey esmerê

Delalê xweş hevalê

Tu keça rind û ciwanê

Tu gula L'kurdistanê

Tu çîçeka gulîstanê

Tu xemla rengê buharê

Hey nazîkê wey esmerê

şêrîne dêm wek buharê

Ketim bexta vê delalê

Ax û eman ji vê buharê

Ji kul û derdê te lê yarê

Ay nazîkê Ay şemalê

WELATÊ

Mezopotamya

JI NÊZ VE NAS BIKE



Dicle û Firat

Mezopotamya navê welatê nav çeman Ferat û Dicle ye. *Mezopotamya* bi zimanê yewnanî tê wateyê *nav dû çeman*. Navê Mezopotamya bi zimanê farsî *Miyanrudan* û bi zimanê arami (suryanî) *Bethnahrin* e. Kurdistan jî di bakûrê Mezopotamya de tê dîtin.

Di dîrokê de li Mezopotamya ya kevn împeratoriyan Sumer, Akad, Babil, Asûran û Îranan hebûn. Mezopotamya çavkaniya olên herî mezin di cihanê de ye.

Îro Mezopotamya di nav sinorên dewletên Tirkiye, Sûrî û Îraqê ye.

Mezopotamya, di naqabîna Dicle û Firatê de Kurdistanê bi sînorê wê hemûkî di nava xwe de. Navende wê Amede. Deme ku mirov li dîroke û li dokumentan jî dimeyîzenê, mirov vê yekê pir baş û qanc dibîne. Deme ku deme şaristaniyan dest pê kir pêde, li vê herême gelek şaristan û pêşketinên weha derketin. Navende wan hemûkan Kurdistan bû. Di deme sumeriyana de ji û di dema aqad û babilan de ji weke Navende wê amed bû. Cizîra Botan ku wê demê navê wê gerzûbaqartan, ji deme hurî - mîtaniyan pêde mazin bi pêşket. Weke pirtûkxanaya Kurdistanê pêşket û weyne xwe di dîrokê de leyist.

Destpêk û dîrok

Mezopotamya ji dîrokê ve gelek xalkê hev cude yên ku bi hev re jîn dibûn cihê wan bû. Di dîrokê de pir goç lê bûna. Ji ber wan goçan hertimî di rêveberiya wê û pêşketinê wê de astang derketina. Wan goç û hatinan, ne hiştiya ku ew xatakê rastûrast di xwe de berdewam bike. Ev ji ji aliyê çandî ve ji wilo ya. Lê çanda wê ya ku pêşketi ji, bi hizre xwe re pêşkeşî ji dîrok û mirovahiyê re kiriya. Gelek şaristanên mazin û bi nav û deng lê jîn bûna. Bi vê yekê re ji diêvêt ku mirov ji bîr neke û bêje ku di cihanê ji bi van xosletên xwe re cihê herî ku tê nasîna. Demên şaristaniyan yên weke yên sumeriyana, aqadan, babilan, Gûtîyan, hurî û mîtaniyan, asuran, naîriyan medan û hwd jîn bûna. Ji xaynî van heke xalkê û şaristanan li Di deme dawî ya qaşayê de hê ku dinye wilo zêde cemidi û mirovan ji ji wê cemidibinê di ravîn û dihatin, xwe di sipartina wir. Ji bo vê yekê hinek cihê ku mirov weke cihên

bicîhbûna demên neolotikê ji bi navkê, li başûrê Kurdistanê li ber çav dikevin. Piştê hin bi hin ku mezopotamya li kok dana zûwabûn di axê de ji dibe, êdî hin bi hin li vê herême Kurdistanê çandin û bi herême Botanê re bi pêşdikeve. Li bakûrê Kurdistanê ji bi zêdeyî Li dore Amedê, li dore Rihayê weke cihên ku jê re Xirabreşkê li wan de li mezopotamya dii deme neolotikê de bicîhbûn dibe. Bi vê yekê re li başûrê Kurdistanê li ber çiyê Çemalû hê li gelek deverên din şûnpê j bo vê yekê tene xuyakirin.

Ta deme ku cotkirin pêşkeve, ahlkirin û çêrandin bibe, jiyana gundîtiyê pêşkeve û nivîs were kifşkirin û were bi karanîn li ber diclê, firatê li ber keviyên Amede û li hin deverên başûrê Kurdistanê bicîhbûn dibe. Di wan deman de jiyana bajartiyê bi pêşketina gundîtiyê re bi pêşdikeve. Hin bi hin ew ji dibin. Awayê bajaran derdikeve hole. Bajar hin bi hin şîn di bin. Bi pêşketina gundan re deme pêşketina bajaran dest pê dike. Pêşketina bajaran ji bi çêkirina xanî û malên weke ku li Govan tene çêkirin derdikeve hole. Derketin û pêşketina bajaran li Kurdistanê berî zayîne di naqabîna 6000 û 5500 wan de dibe. Di vê pêşketinê de bi qasî ku tê gotin to çanda bi awa derdikevin pêş çanda Abaîd û xalaf e.

Her weha piştî van pêşketinan, deme Urukîyan dest pê dike. Deme wan ji, deme şaristaniyê ya. Ev dem bi qasî ku tê fahm kirin di berî zayîne di naqabîna 4500 û 3500 wan de xwe dide ber çavan. Ev dem, demeke di hizir û di deme şaristaniyê de demeke pêşketiya. Di wê demê başûrê Kurdistanê mirov karê bigiştî ji bi pêketiya. Pêşketina Urukîyan ne tenê di qada çande de ya. Ji pêşketina teknolojîyê de ji ya. Di deme Urukîyan de cotkariya avî û karên madanê û çandin û di qada tekonojîyê tekonojîyê de pir li pêşîn. destana Gilgameş vê yekê radixe berçavan. Baziganî ji bi pêşketiya. Çûnûhatinaka mazin di wê de ji bo bazirganiyê li mezopotamya pêşdikeve. Di wê demê de nivîs bi pêşketiya û di qada rêveberî û dewlete de qeyd kirin ji dest pê kiriya. Ji kêvalbarên wê demê, mirov vê yekê fahmdike. Başûr di vir de ji başûr zûtir û pêşketir e.

Sumeran, pêşketin û şaristaniya pêşî

Li Mezopotamya, deme şaristaniyê ya pêşî, ku berî şaristaniyên din hemûkana û hîmê wan afirandinya Şaristaniya sumeriyana. Hem di nivîs, tendûrîstî, astronomî, matamatikê û hem olê, falê, afsûnê û di mîtolojîyê de yên derketina pêş û pergala civakê afirandina sumerîyan. Li afirandin û tufanê pêşî mirov di wan de rastî wê têt. Di deme sumeriyana de nêzikî 35 bajar hene. Ji wan nêzikî 17 an yên herî mazin. Minaq; Kîş, Nîppur, kurda, Zabalana, Umma, Lagaş, Erîdû û Ur yên mazin. Navê wan heya. Xwûdanan wan mazin û bi nav û deng.

Li Lagaşê keyê hati ser rêveberîyê Ur-nanşe bi çêkirina malan û xaniyan nav daya. Uruqağna bi xwenûkirin (reformên ku wî pêşî nivîsandina derdikeve pêş. Lê di demên 2400 û 2350 ku hin bi hin bi br ketinê ve diçê, êdî hin bi hin li mezopotamya Aqadî derdikevine pêş û serwer dibin.



Aqadan û demên piştê

Tê gotin ku bi koka xwe re Samî ne. Çand û hizre sumeriyana di xwe de bicîh kirin û rûnandin. Piştî sumeriyana re yên ku bûna serwerê mezopotamya Aqadî bûn. Ji deme hizre hemde girtin û bûna pêşavaniyê deme hemdem. Aqadiyan her weha xurt dibin û ku weke wan bi koka xwe tê gotin ku Samî ne, bingihê mazinbûna babilîyan û Asurîyan dikin. Hizre sumeriyana pêş xistin. Ji wan zêdetir wan hizre keyitiyê GERDÛN û DINYÊ afirand û bicîh kir. Rêveberiya navendî cara pêşî di deme wan de di bin destekê de digihê hevdu. Lê di berî zayîne di 2150 de ku careke di sumerî bi hêz dibin û mazin di bin û serwer dibin, êdî dawiyê li dewlete wan tînin.

Damazranê xanadana Aqadiyan Sargona. Sargon ketiya 34 şeran de li gor qeydan. Peytaxta xwe ya bi navê Agade avakirya. Zanebûnên di derbarê wî de bi mîtolojîyê re tevlîhevîn. ê di derbarê wî de têgihîştineke didine mirov. Neviyê wî Naram-Sîn dişopa wî de meşiya û wî gelek şer qizinc kirina. Şervanekî mazin bûya. Piştî deme Naram-Sîn re yên ku dawiyê aqadan ji tînin Gûtî ne. Gûtî, weke cara sêyemîn rabûna sumeriyana ji mirov bîne ser ziman. Hizre wan pêşketi bû. Di hizre xwe de û têgihîştine xwe de ew xwediyê têgihîştineke ku Hegel bi navê diyelektikê bi pêşxistiya bûn. Pişt wan re yên ku ew hizir û şopa wan berdewam kir ji, Naîrî bûn.

Sêyemîn xanadana UR û demên piştê ta deme medan

Gutiyan li jiyana xwe ya civaknasî hizirin û zêde di rêzaniyê de pêde neçûn her ku serwerî mezopotam giştî ji bûn. Lê di wê demê de xanadana ur ya deme sêyamîn di wê demê de jîn dibû. Wê ev firsand bikar anî û serweriya rêzani kira dest xwe de. Nêzikî sad salî tê goin ku li ser rêveberiyê (b. z. 2100-2000) man. Uran, bajarên xwe di wê demê de kirna yên ku ji aliyê rêzanî ve yên herî mazin û bi hêz. Di demên wan yên dawiyê de bi êrîşên hevirdore kaldikevin. Dawiyê xanadana Uran, dibe dawiya sumeriyana ji li mezopotamya ji ji aliyê rêzanî ve. Pişt wan r êdî hêzên ku ne ji herêmê ne, serdestiyê digirine dest. Êdî serdestî ne keve destên wan de

Lê ji aliyê çandî û hizirî ve ew hertimî serdestin. Ew kifşdikin. Ji aliyê olî ve ji wilo ya.

Bi ketina xanadana Ur e sêyamîn re, êdî li bakûr Asur hêdî hêdî cih tiştî dikin û li başûr babil derikevina pêş. Babil êdî li vir derdikeve pêş Hûrî, di wê demê de, ew hêze wan ya ku zayîf bûyî, careke di dibe û mazin dibe û serwer dibe. Rûpel (19)

Newaf Mîro

newafmîro@gmx.de

NAMEYA BI TIRKÎ Û LEŞKERÊ ROMÊ

Dewrêş ê kurd, yê delalî çûbû leşkeriya tırka. Bihatina wê leşkeriyê, ya ku wî hêjî nizanîbû ji bo çi? û ji bo kê? dike. Dewrêş bi hatina leşkeriyê re, navê wî bûbû Dervîş Turk. Ew tirkê ku, hêjî bi tirkî nizanîbû. Tevî ku paşnavê wî tirk bû. Ne hew tirkî, wî nizanîbû bixwîne û binisîne jî helbet. Vêca bi hatina leşkeriyê re ew bûbû çewalê boksê ji bo fermanîdar û rayedara. Heta ji bo herkesê, ku bi tirkî dizanîbû. Yê silav bidayê, li şûna silavê li wî lêdidan. Çenko kê çî bigotayê ew tê nedigihîşt. Kesê teneğişt jî, her kê û hov bûn ji bo wan. Lewma jî ew hêjayî çêr û ledanê bû. Gotinên fermanîdaran yê herî pak; “Kehr kurê kehrê” bû. Ev ne bitanê ji bo Dewrêş dihate gotin, ji bo hemû leşkera dihate gotin. Lêdan û êşkence, ji jor ve dihat, û heta xwe berdida binî. Yê ser û serdest mafdar bû, ji bo lêdana, yê di pîleya di bin xwe re. Di nava yê kevn û nûde jî, heman pîvan derbas dibû. Meheke Dewrêş bihurîbû, hêjî name û dîmen ji malbata xwe re neşandibû. Neku ne dixwest, ew ketibû hewla can û jiyane. Rojekê bi alîkariya xortekî kurd, çûbû ba xortekî din. Yê ku bi nivisandina nameya bûbû nûser. Gava Dewrêş hatibû cem wî, wî raste rast dest bi nivisandina name yê kiribû jî.

“sayin muhterem babacigim, size ve anneme çok çok selam eder ellerinizden öper, saglik ve selametinizi yüce Allahtan niyaz ederim. Şayet beni soracak olursanız, hamd olsun çok iyiyim. Nenem İmme ye selam eder ellerinden öper ve saglik ve selametini yüce allahtan dilerim.”

Û nûser dinavênê de navê xizmên wî dipirsî û dinisand. Û gava navê xizmên xwe bilêv dikir çizîni ji kezeba wî dihat. Û qirika wî tije grî dibû. Ger karibûya û bibûya wî yê hemû derdê xwe binivîsanda. Lê ne ji wî dihat û ne jî karî bû. Di dawiyê de nivisandibû; Lawê we Dervîş. Gava nûser ew name dabûyê, destê wî dihejyan û li şûna hêsira lîka wî diherikî. Weke ku hêsir xwe berdin bêvila wî û di bêvilê re biherikin. Bi wê kelegermê wî polek bi wê nameyê ve kiribû û şandibû.

Maliyên wî her roj çav li rêyê wî û nîşanek ji hebûna wî ya li jiyane bûn. Bi taybetî jî dapîra wî İmmê. Wê her êvar û heroj stran diavêtin ser Dewrêşê xwe. Ew serê sibeha ji xewê radibû heta êvarî çav li rêya mizgîniyekê bû. Gava rojekê danê êvarî ji bajêr name ji wan re hatibû, ew bi kêf ber bi mala cîran ve çûbû. Gava name anîbû, berê bi zarokê ku diçû dibistanê xwendin dida. Gava zarok dest bi rêzkirina tîpa kir û ew peyvên tede hatibûn rêzkirin xwend, pîrê bi baldarî guhdarî dikir. Û her digot çî gotiye? Lawik digot; gotiye, ez silava li bavê xwe û diya xwe dikim destê wan maç dikim. Saxî û selametiya wan ji Xwedayê mezin dixwazim. Ger hûn li min birsîn ez başim. Û te jî silav dike û tê destê te jî.

Allahtan dileriz. Nenen İmme sana selam eder ve karakaş gözlerinden öper. Ve senden bir fotografını istiyor. Kardeşlerin Sadun, Sêvo ve hepsi sana selam eder ellerinden öperler..

Pîra İmmê, gava navê wê hatibû destnişankirin, hinekî xwe hêsantir his dikir. Lê vê nameyê qet birîna wê derman nekiribû. Ew name xiste paşila xwe û ber bi malê ve kete rê. Wê nema ew name dida kesekî din. Û her kesê karibûya bixwenda, pê dîsa dida xwendin.

Piştî wan name girtibû bavê Dewrêş Bûbê nameyek nivisandin dabû. Helbet dîsa bi tirkî. Û wîsa rêz kiribûn.

Sayin oglum Dervîş, sana çok çok selam eder gözlerinden öperim. Annan sana çok çok selam eder gözlerinden öper. Bizi soracak olusan hamd olsun hepimiz iyiyiz seninde iyi olmani yüce

Gava çûbû bajêr ew name dabû postê û çavê wan li rêya nameyek din vekirî dima. Gava name gihîştibû Dewrêş, Dewrêş bi heman kelcanê ber bi nûser ve çûbû, nûser heman silav û hewal jê re xwendin û didawiyê de got; dapîra te ji te dîmenekî dixwaze. Dewrêş bi heman hestê ew name dida ser bîna xwe û bêhn dikir weke ku bîna xizm û xwedîya û war û ciya jê were dida ser çav û dilê xwe. Roj dibuhurîn, lê ji bo Dewrêş roj meh û salbûn. Qet ne dibuhrîn. Wî dixwest dîmenekî ji bo Dapîra xwe bikişîne, lê brîne li can û bi taybetî ya li lêva wî qet sax nedibû. Piştî çendakî dîsa berê xwe dabû cem nûserê nameya. Dîsa heman tekst û silav ji wî re rêz kiribû;

“sayin muhterem babacigim, size ve anneme çok çok selam eder ellerinizden öper, saglik ve selametinizi yüce Allahtan niyaz ederim. Şayet beni soracak olursanız, hamd olsun çok iyiyim. Nenem İmme ye selam eder ellerinden öper ve saglik ve selametini yüce allahtan dilerim.”

Bêyî ku pirsên cûda ji Dewrêş bike. Ji bilî nava. Zikê Dewrêş tije peyv û gotin bû, lê nikaribû bîne ziman. Serê her çend peyva her digot; Fotograf, fotograf. Vê carê nebû ezê careke din bi şînim. Gava nûserê nameya dîsa name dabû destê Dewrêş, têra xwe gilî û gazimcên xwe bi ser nameyê ve kiribun. Weke ku bi xizmên xwe re bi peyvê. Piştî ew çend ponijandin û grî, name dabû postê.

Dapîra wî her çavli rêyê wî û nemayê wî bû. bawer nedikir ku dîsa rojekê wî bibîne û hemêz bike. Gava rojekê bavê Dewrêş Bûbê çûbû bajêr, bi xwe re nemaya Dewrêş anîbû. Kêliya çav li nameyê ketibû hindik mabû ji şabûna re bi fire, tevî wê pîr bîna xwe. Û ew name dîsa bê rawestan maç dikir û di ser û çavê xwe dida.



Ji kurê xwe pirs kiribû ku çî gotiye. Bûbê jêre gotibû, lê dilê wê ne dikerte cih. Lewma jî dîsa çûbû cem lawikê cîrana. Her çend bi xwendina wî jî qayil nedibû, û xwendina wî dilê wê ne dikewand jî. Dîsa lêwik dest bi xwendina heman têkstê kiribû.

“sayin muhterem babacigim, size ve anneme çok çok selam eder ellerinizden öper, saglik ve selametinizi yüce Allahtan niyaz ederim. Şayet

beni soracak olursanız, Piştî çend rojan bavê hema hema bi heman têkst û gotina name ji wî re şandibû. Dubare daxwaza dîmenekî wî kiribû. Lê ne wê nameyê barê xeman sivik dikir û ne jî kula di dil û canê wî de dikewand.

Dewrêş di artêşgehê de, ji bo karê herî gran xwe dida pêş. Ji bona kêliyê be jî, ji ber dar û koteka derkeve. Karê firaxşûştinê, darbirînê, kevirkişandinê, komirkişandinê, û yê destavxanê li ser piştta Dewrêş bû. Herkesî bar û karê xwe bi wî dianî cih. Di nêrîna wan de Dewrêş tewtewe û dîn bû. Dewrêş ji herkesî re digot; Komtanim! Carcaran ji bo vê peyvê jî lêdan dixwar û digotin; Ûlan ît oglu ît, komtanim deyil Komûtanim.. Komûtanim denilir.. Ango; Se kurê se. Ne komtanim. Komûtanim.. Dewrêş jî digot; Hee komtanim.. Komtanim! Çav li wan sor dibûn û bi kulmistkan dihatine wî û diçûn.

Piştî çend rojan Dewrêş xwe neçar didît dîmenekî xwe bigir û tevî nameyekê ji malbata xwe rê ke. Gava ku dîmen girtibû, xwe bi xwe li dîmenê xwe nihêrî bû. Çavê wî bi kort ve çûbûn, rûyê wî çilmisîbû. Rî û simêlên wî yê reş êdî nemabûn. Pozê wî ji her demê bêhtir drêj xuya dikir. Û guhên wî weke du mastêrkan xuya dikirin. Dev û lêva wî ya brîndar, ku hîna jî şûna derba fermanîdar sax nebûbû. Ew brîna wî hindik mabû jî, lê hîna dihate dîtin. Jixwe di serê wî ew kepê leşkeriyê hebû. Herçend xwestibû bi rûkenî û gewz, poz bide lê nebûbû. Xemgîni û melûliya wî di çavê wî de xuya dikir. Dewrêş bi xwe li dîmenê xwe nihêrî û pere xemgîn bûbû. Lê neçar bû ku ji malbata xwe re dîmenekî bişîne. Gava çûbû cem namenûser wî vîcarê hêjî bêdaxwaz dinivîsî. Bêyî ku pirsên zêde bike, name bi heman cûreyî nivisîbû. Li piştta dîmen wî jî nivisîbû; Bu bîr asker armaganidir! Amasya. Ango; Ev diyariya leşkera ye. Bajarê Amasya. Dewrêş li destê wî nihêrîbû û dilê wî tije galegal bû. Lê dev hebû, ziman nebû. Dest hebû, lê destê pênûse bigire nebû. Hiş hebû, lê hişê tîpa rêz bike nebû. Û çavê wî ne perdeya sînemayê bû. Û dil ne sifre bû, ku raxe. Daku were dîtin. Jixwe kesê wî fêhm bike û jêre bibûya pal û pişt nebû. Herkes ketibû derdê xwe, û ji xwe re li starekê digeriya. Jiyan bûbû dojah û cor ji bo Dewrêş. Û Dewrêş çirke, xula, demjimêr, û roj diji martî, dakû rojekê ji vê rewşa kambax rizgar bibe. Gava mane biribû postê têra xwe dîsa bi ser wê nameyê de griyabû.

hamd olsun çok iyiyim. Nenem İmme ye selam eder ellerinden öper ve saglik ve selametini yüce allahtan dilerim.”..... **Rûpel (19)**

Abbas Abbas



WELATEKÎ BERAVÊTÎ

Di civîna partiya(?) kurdistanî de, nûnerê wê li ser kaba rûnişt û tilaya xwe dirêj kir û bi dengê Şoreşgerî qîrî û got:

-Armanca me ya herî taybet di pêşerojê de, ewe ku em welatê xwe ji qirêjê paqijkin, êdî xebata me wê li ser vê armancê berdewam be!...

Kesên lê guhdar, serên wan li hevket, hina gotina qerêj, leşkerê dijmin didîtin, û hina partiya dijmin, û hina jî partiyên kurdan yê ne di rêza partiya wan de!..

Lê jiber ku Nûnerê Şoreşvan rê neda pirs, guhdar man di heyra xwe de û ew jî ma ser gotina qirêjê û teybetmendiyê paqijkirinê!..

Kesên leşkerên dijmin qerêj di dîtin, zulm û zordariya wan di hat bercavan, bombe barankirina gundên wan, girtin û kuştina hevalên wan, wêrankirina zevî û bihara wan, valakirina gund û bajarên wan!...

Û kesên partiya dijmin qirêj di dîtin, zagonên ewrte û sextekariya bi wan hatî derbaskirin, Ev partiya ku jiyana di vî welatî de pêve hatiye girêdan, ku êda ne bi razîbûna nûnerê wê be, jiyana derbas nabê û na levê!..

Dawî jî, kesên ku partiyên kurdî yê ne di rêza nûnerê wan de, qerêj di dîtin, sexte kariya xebata wan û paşketina serokên wan, wilo jî ew gunihkar didîtin, ku sedema paşketina xebata milletê kurd û ne yekîtiya wan in!..

Lê birastî, ya di dilê nûnerê partiya wan de, ne yek ji van bû, jiber wî ti ştek qirêj li ber çavên xwe ne didîtin, ji xeyênî wan xortên jîr û zane pêve, ku di nav civata partiya wî de cih girtine!..

Ev xort ne bi tena xwe, jîr û zane ne, lê belê wî û kesên wek wî, ku di nav partiyên kurdan de cih girtin û xebata sexte derbas dikin, qirêj dibînin!..

Loma, nûnerê partiya wan, ew dan ber şirtikê paqij kirinê, û bi rastî ne daxwaza wî bi tena wî bû!.. Lê belê ya kesên pêre ku wek wî xort qirêj didîtin!...

(Êdî bi texmîna we, wê ev kesên dî... Kî bin?..)

Aniha hûn dizanin, yê herî qirêj û xebat sexte di jiyana milletê kurd de kî ne?..Û dawî jî sedema parçe kirina partiyên wan, çi ye û kîne?..

Serhan Isa

serhanisa@hotmail.com

Pênûsa Min îro

Ji hembêzeka qeşagirtî re



Oh... oh..

Îro Ahoyan

Di bejna te de stihên xwe şikandin

Û xwe di sîpanê xelatê evîna me de werkirin,

De were

bi ken,

bê ken,

bê razan,

bê zarok, bê jin,

pişte vala,

tenê bi hembêza xwe ya pir sincirî were,

were Yara negotî,

were em pariyek şev hev bibêjin,

were ey mêya ne mîna mêyan,

were ey xweştirîn sirûda eşqê,

were em vê şevê ji lûs rakin,

û ber bi Sîpanê Xelatê ve bajonin

were ez ê heyvê mist bi mist,

di çvên te defêrî razanê bikin,

were pêlên bejna xwe ya kewitî,

bi ser min ê şor de serbijêrke,

were xelkê min,

şevên pîrepayîzê pir kûr û dirêj in,

were xelkê min,

herdu lêvên min yê gemkirî,

di nava cotên memîkên xwe de rake pîkolê were hewesa min were,
min li ber cipîne guharên xwe bilorîne,
were di ceyografiya vî textî de,
em şevê fêrî eşqê bikin ,ey yara derenghatî,
ey sira şevê,
tuyê van dem û kêlîkên bê guneh,
yên ku li dûv me dixirxirin,
bi kûve bajonê ey yara derenghatî,
te gemyanên min bi sîtavên bejna xwe dorpêç bike,
were bera êdî sozên me şehîd nekevin,
ka bêje yar,
ka bêje û bêje,
te çend reng û deng,
di oqanosên bejan xwe de dernixwîn kirin,
de were,
bi hembêza xwe ya qeşa girtî,
bi lêvên xwe yê jirêketî
û ez bi vê şorahiya xwe
em ê xwe,
di Sîpan û Xelatê evîneke derenghatî de werkin
ey yara derenghatî.



Hoseng Broka

hoshengbroka@hotmail.com



**„Dewleta Serê Kaniyê“:
ne dersa pêşî, ne jî a dawî ye!**



Dagîrkirina „Serê Kaniyê“ di „Sûrya artêşa azad“ de, li ser destên hin gurûpên wê yên tundrew û terorkar (wek „Cebhet El-Nusra“, „Ketayib Xurbaa El-Sham“, „Ketayib Ehfad El-Resûl“...htd.), ku projeyê wê wek hêzeke xurû „sunî“ jî „sûryayeke pîrr bo hemû sûryan“ wêdetir projeyê „Sûryayeke sunî“ ye, ne nagehamî bû. Ew dagîrkirina nerewa, ku ji şoreşê bihtir teror û terorkirin bû, li gorî Sûrya aneşa û berdest, ku li seranserî dora 2 salan, ji xwînê diçe xwînê, ji talankirinê diçe talankirinê û ji tolvegirtinê jî diçe tolvegirtinê, wek „rûdaneke terorkar“, ji mêj de, ciyê texmînkirinê û herweha berê derfetekê jî bo realîzekirinê bû.

Hêjayî amajepêdanê ye, ku ev şerê ku li seranserî dora du salan berdewam tê meşandin, şerekî ne tenê herêmî belkî navdewlî ye jî. Her kes li Sûryayê ji bo xwe li ser hesabê Sûryayê û xelkê Sûryayê şerê her kesî dike. Her kes dixwaze problema hundirê xwe, li Sûryayê û li ser hesabê hundirê wê, safî bike.

Heyfa „Buhara Erebî“ tev ji gelên Sûryayê, tê hilanînê. Rast e ev heyfeke pîrr „tahl“ e, lê ew di heman demê de, „rastîyeke sûrî“ ye jî.

„Serê Kaniyê“, bo „Sûrya Erebî“ bi giştî û „Sûrya bi Kurdî“ bi taybetî, derseke ne tenê mezin, belê pîrr bû jî. Lê xelkên siyaseta herdu Sûryayan dê çiqasî bikaribîn mifayê jê werbigirin, ev bazareke din û ciyê mijareke din e.

„Serê Kaniyê“, bi qasî ji der û hundirê Sûryayê re, herweha ji dost û dijminên wê re jî, baş da eşkerekirin, ku Tirkîye êdî ji dewleteke „cîran“ wêdetir, ew wek dewleteke „destêwerdkar“ di karûbarên paşeroja gelên Sûryayê de, tevdigere.

Bi qasî Îranê, wek serkêşa „Bloka Şîhî“ (Îran + „Iraqa Şîhî“ + Sûrya El- Esed + Hizbullah + berikên şîhî li dewletên Kendavê), ku piştî rejîma Sûryayê digire û bernade, di mafê gelên Sûryayê de, tawankare, hewqasî Tirkîye jî, wek serkêşa „Bloka Sunî“ (Tirkîye + Saudî Erebistan + Qatar ligel dewletên Kendavê yên din + „Iraqa Sunî“ + Berikên Sunî di Cîhana Erebî de), ku ji destpêka şoreşê de, kontrola hindekan ji rikberiyên Sûryayê (bi taybetî rikberiya sunî a bi serkêşiya „Ixwan El-Muslimîn“) dike, di mafê heman Sûryayê û heman gelên wê û paşeroja wan de, ne tenê tawanbar, belê tawankar e jî.

Ji roja roj de, ku „Istanbul“ bû „paytexta“ rikberiya Sûryayê a „sunî, Tirkîye biryar daye, ku Sûrya paş Beşar El-Esed, gereke Sûryayek xurû „Sunî“ li dij mafên „Ne-Sunîyan“ û Kurdan, li gorî kêfa hikumeta AKP û li jêr kontrola îdeolojiya wê a „Tirko-Islam“ be. Helbet Tirsa Tirkîyê ji Sûrya paşerojê tirseke ne bi dizî, belê eşkere ye. Wê pîrr caran ev „tîrsa stratejî“ bi rêya hin berpirsên xwe yên bilind, aniye û hîn jî tîne ziman. Lewre, wezîrê wê yê Karûbarên derve, Ehmed Dawûd Oglu, pîrr caran, dîrekt yan jî indîrekt, aniye ziman, ku „problema Sûryayê bi

qasî ku a hundirê wê ye, hewqasî a hundirê Tirkîyê ye jî“. Helbet mebesta Oglu ji destnîşankirina vê tîrsa ji wê pîrsê, di serî de, tîrsa ji pîrsa Kurdî ye.

Tirkîye baş dizane, ku rêya kontrolkirina Sûryayê ji bo berjewendiyên wê yên stratejî, di kontrolkirina herêmên Kurdan re, derbas dibe. Ev siyasteke Tirkîyan a eşkere ye. Mafê Kurdên Sûryayê, bê guman, parçeyek ji mafê gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê ye, ku 20 milyon Kurd (anku zêdetir ji 20% ji hejmara giştî a nifûsa Tirliyyeyê ye), lê dijîn. Lewre, problema Kurdan wek problema hundirê Sûryayê problema hundirê Tirkîyeyê bixwe ye, wek pîrrcaran li ser asta rayedarên wê yên bilid, hatiye û hîn jî tê ziman.

Tirkîye ji ber lawaziya hundirê xwe, yê bi mafê Kurdan re pîrr bi problem, ji teqîna hundirê Sûryayê, anku teqîna problema Kurdên wê, ditirse.

Ew ji tîrsa mafê Kurdên xwe, şerê mafê Kurdên Sûryayê dike, û heta jê tê rê li ber wan digire û dê her bigre jî.

Ew ji tîrsa Kurdîstana hundirê xwe şerê Kurdîstana hundirê Sûryayê, dike.

Wisa diyar e, ku Tirkîye ji ezmûneya 2003an, ku di serencam pasîvbûyîna wê a di wê demê de, Iraqeke „nuh“ ligel Kurdîstaneke „nuh“ a „nîv-serbixwe“ û „nîv-dewlet“ rû da, sîdeke baş, wergirtiye. Lewre, ew naxwaze şaşîya xwe ya stratejî ku li Iraqa paş Seddam, têwerbûye, li Sûrya paş El-Esed, careke din, dubare bike. Li pey berjewendiyên xwe yên stratejî û bilind, ew dê hemî hewldanên xwe bike, daku „Kurdîstaneke diwemîn“ mîna „Herêma Kurdîstana Iraqê“ li ser sînore wê yê dirêj bi Sûryayê re (850 km), rû bide.

Lewre, destên Tirkîyeyê di şerê „Serê Kaniyê“ de, wek destpêka şerekî pilankirî li dijî mafê Kurdan, li Rojavayê Kurdistanê bi taybetî û li aliyên din yên Kurdistanê bi giştî, ne destine veşartî û bidzî ne. Bi qasî Kurdan (hemî Kurdan) li „Serê Kaniyê“ maf û daxwazên xwe birin eşkerekirinê, hewqasî agendayên Tirkîyeyê û daxwazên wê ji şoreşa Sûryayê û xelkên wê jî, çun eşkerekirinê.

Li „Serê Kaniyê“, Tirkîye (ligel gurûpên ser bi wê ve, yên oposîsyona Sûryayê çî a siyasî çî jî a leşkerî) şoreşa Sûryayê li ber çavên tevaya dinyayê, bi „şoreşvanên“ wê da xwarinê. Wê şoreş bi şorşê da kuştinê, û herweha şoreş jî bi şoreşê bir nefretkirin, tesfîyekirinê û têkbinê.

Ligel hemî windayîyên, ku heta aneşa „Serê Kaniyê“ û dorûberên wê, wek „berxwedaneke bi Kurdî“ mezin, dane, mirov dikare bisteh bibêje, ku Kurdan wek xwedanên mafekî rewa, di Sûryayeke rewa de, beramberî Tirkîyeyê û „şoreşvanên“ wê (çî yên siyasî, çî jî yên çekdar), heta bi vê kêlikê, qezenc kirine.

Tirkîyeyê (ligel rikberiya Sûryayê a ser bi wê û „

Bloka Sunî“ ve) bi ya min di şerê „Serê Kaniyê“ de, sê caran wînda kirin:

Carekê ku Kurd (çî li hundirê Sûryayê, çî jî li derveyê wê, li parçeyên din yên Kurdistanê) li dijî neyarên mafê wan kirin yek û ew bihêztir û bixwebawertir kirin. A diwemîn, Ku rûyê oposîsyona Sûryayê wek „rûyekî xurû sunî“, da eşkerekirin, ku projeyê wê ji projeyê „Sûryeyeke pîrr“, demokrat, medenî û sekuler wêdetir, ew projeyê „Bloka Sunî“, îdeolojiya sunî, wate projeyê „Ixwan El-Muslimîn“ û „elahûekberîyan“ e, ku projeyê wan di serî de, projeya „dewelteke dînî“ û „antî-medenî“ ye. Cara sêyemîn jî, Ku ji der û hundirê Tirkîyê re baş hate diyarkirin, ku desttêwerdana wê a bidzî û eşkere tenê tê yek wateyê, ew jî ev e: Tirkîye dixwaze Sûrya sibê (yan jî Sûrya şoreşa lidar) ji dewleteke serbixwe, xwedanbiryar, demkrat û medenî bo hemû Sûryan wêdetir, wekî Qibrîsê bibe „berîkek“ ji berikên wê. Jixwe destnîşankirin û danîna waliyekî bi navê „waliyê Sûryayê“, di meha derbasbûyî de, ku rastûxo bi wezaretê karûbarên derve ve girêdayî ye, tam ser û binê vê siyaseta bi Tirkî, dupat û eşkere dike.

„Serê Kaniyê“ derseke ne tenê mezin, belê pîrr e jî, ne tenê ji bo Tirkîyan û „şoreşvanên“ wan yên „sunî“ û herweha hevalbendên wan, belê ji bo Kurdan û Kurdistanên wan jî.

Lê, bi qasî ku „mantiqê“ xwîna li Sûryayê, kathejmêr bi kathejmêr, tê kuştin û helalkirinê, dibêje, ew dê ne dersa pêşî, ne jî a dawî be. Lewre, ji her kesî bihtir, gereke Kurd „Serê Kaniyê“ bo xwe bikin hem ders, hem jî dibistan.

Ji „Serê Kaniyê“ û şûn de, gereke Kurdên Sûryayê bi taybetî (çî Kurdên encûmena A, çî jî Kurdên encûmena B; çî Kurdên „lêvegera Barzanîzmê“ çî jî Kurdên „lêvegera Ocalanîzmê“) û herweha Kurdên derveyê wê, yên aliyên din ên Kurdistanê bi giştî, gereke êdî hemû Kurd wênayê xwe, wek Kurdên yek Kurdistanê, di eyniya „şoreşa Sûryayê“ de, ku di heman demê de, eyniya îdeolojiya sunî ye, baş bibînin, bixwînin û herweha baş binirxînin.

Di vê eyniya xurû „sunî“ de, ku li gorî agendeyên „Bloka Sunî“ a dij bi „Bloka Şîhî“, hatiye pilankirin û durustkirinê, Kurd tenê wek yek Kurdî tê dîtin û mehkûmkirinê: Kurdê Rojava, bi qasî bejna mafê birayên xwe yên din, li aliyên din yên Kurdistanê, Bakur, Başûr û Rojhilat, „terorîst“, „şeytandost“, „israildost“ û herweha „cudaxwaz“ e. Di vê eyniya „tayîfegir“ de, „Kurdê sipî“ û „Kurdê reş“, yan jî „Kurdê baş“ û „Kurdê nebaş“, tune ne, belê tenê „Kurdê bi tirkî“, „Kurdê bi erebî“ û „Kurdê bi farisî“ hene, ku tev jî, Kurdên bê çand, bê kultûr, bê ciyografî, bê dîrok, bê bîr û bê tedbîr in. Di vê eyniyê de, tenê Kurdek heye, ew jî Kurdê tenê bi asman û quraan, lê bê erd û bê Kurdistan e.

Paş serkeftina „Serê Kaniyê“, ku yekîtiya Kurdan, li wir, heta aneşa bi ser keft, mafê hîç kurdekî, hîç partiyekê, hîç hêzekê, hîç serokekî û hîç îdeoljîyekê qet tune ye, ku Kurdan ji Kurdan, yan jî Kurdistanê ji Kurdistanê, bide cudakirinê.

Paş bilînbûna pileya „YPG“ wek „Hêzên Paratîna Gel“ li Rojavayê Kurdistanê, ku di heman demê de, hêzên parastîna mafê hemî Kurdan in, êdî ne mafê Kurdên „Kurdîstana Sûrya A“ heye, **Rûpel** (?)

Ebdulbaqî Huseynî

zanin88@hotmail.com

Arşevê Oskan di asoyê toreya kurdî de

Hevalbendê peyva kurdî Arşevê Oskan, ê ku min wî di riya tore û çanda kurdî de naskir, di riya zanîn û hizrên netewî û helwestên keleşorî de, ew bû hevalê koma me nivîskar û rojnamevanên Rojavayî Kurdistanê,...

Di salên 90î de ji çerxên bîstan ve, dema min û helbestvan Ferhadê Çelebî kovara Zanîn derdixist, me gelek mirovên rewşenbîr ji hemî herêmên kurdî ve naskirin, ji bajarê Dirbêsiyê, çend torevanên hêja ku ew jî evbûn; Fethulla Huseynî, Xemgînê Remo, Ciwanê Evdal, û Arşevê Oskan bû.

Ji wê demê û vir de peywendiyên me bi nemir Arşev re xurtbûn, ta roja dawî ji jiyana wî de, ew têkilî hebû, ku danûstandina min û wî li ser endametiya Hevbenda nivîskar û rojnamevanên kurd li Sûriya bû, ku di riya Facebookê de ew gengeşe çêbû.

Kurd dibêjin; Mêr dimre, nav dimîne!

Mirovê ku di jiyana xwe de karekî berbiçav kiribe, wê demê navê wî mirovî tucarî nayê jibîrkirin, û bi tîpên zêrîn di dîroka mirovatîyê de tete nivîsandin. Nemaze ku ew kar di warê zanestiyê de be, û tore û çanda wî miletî biparêze.

Berî demekî ne dirêj Hevbenda nivîskar û rojnamevanên kurd li Sûriyê endamêkî xweyî payebilind, nivîskar û hozanvan Arşevê Oskan windakir.

Di vê koçbariya bê veger de, Arşevê Oskan jî giha refê nivîskar û torevanên kurd ên ku di van deh salên dawî de çûne ser dilovaniya xwe, û meydana çandeyî û toreyî a kurdên rojava û Kurdistanê valakirine, ew kesên ku bi pênûsa xwe hiştin ku peyva kurdî zendî bimîne; ji wan kesan; Seydayê Tîrêj, Keleş, Bêbuhar, Ferhadê Çelebî, Rizo, Omerê Lalê, Selah Berwarî, Mihemedê Tûj û Miş'el Temo.

Ev kesane mirovin nemirin ji ber ku berhemên wan zindî ne, û ji şagirtên pêserojê re dibe çira û riya wan ronîdike..

Nemir Arşevê Oskan, gencîneke pir dewlend bi dû xwe ve hiştiye, ewî bi berhemên xwe pirtûkxana kurdî xemiland. Wekû tê zanîn ku Oskan ji mêjve ve dest bi nivîsandinê kiribû, ku di destpêka 1990 dema kovara Zanîn li darbû (wekû min li jor daye xuyakirin), Arşev yek ji nivîskarê wê bû, û bi berhemên xweyî toreyî rûpelên Zanînê dixemilandin, û di ber de dîwana xwe a yekem ku binavê " **Hêviyên birîndar**" amdedikir, ta sala 1995 da çapkirin, û wiha riya toreyî û çandeyî şopand.

Berî ku Arşev ji welêt penaber bibe, ewî ligel çend hogirên xwe kovarek bi navê "Zevî" dida çapkirinê. Paş re li tarawgeha xweyî dawî li bajarê Hamburgê li Elemaniyayê bi cih bû, û li wir rojên xweyî dawî qedandin,...

Arşevê Oskan hezkirê peyva kurdî bû, mirovekî hest tenkbû, helbestên wî tijî evîn, keser û xembarî bûn, ... çiqasî derbarî vî mirovî bê gotin, hindike û kême, cimkî gotin lihemberî kar û xebata Arşevê Oskan pepûk dimînin.

Di vê gotarê de ezê berhemên Arşevê Oskan ên ku di Kovara Zanînê (1991-1997) de hatibûn belavkirin ji xwendevanên rojnameya **Pênûsa Nû** re dubare bikim, bi hêviya ku sudeyekê jê bibînin.

Berhemên Arşevê Oskan di kovara Zanîn de:



Di Hejmara (6) sala 1992 de, bi helbesta "Dilber" rûpelên kovarê xemilandbû, di vê helbestê de digot:

"Birînim ji tîra dilberê

Dil ji ber ah û nalîne

Dema ber tîra cegerê

Hijî ceger jiber xwîne

Ji awiran tîr bi şewt tê

Sotim arê evîna te

Li civîna min tu hew tê

Jan da êşa birîna min

Dijware ev birîna te

Derdekî nîne dermane

Hêvî nayê jiyana min

Ti bû sitemkara cane

Ji ber çavên belek heyran

Kuştim van biskeyên bi dav

Bê dil û can kirim talan

Bê rewşen ez kirim talan

Ebrû meha min tu kanî

Ji pîrsê keser dikşînim

Bîzotek ar li ser danî

Ji ber şev û ro ahînim

Nîsrîna min şêrîne nav

Li ber çavaye rengê te

Lê gulistana me bê av

Kete guhê min dengê te".

Di hejmara (10) sala 1995 de, bi du berhem beşdarbûye;



A yekê, beşdarbûna wî di hevniwîsa ku li ser Ehmedê Xanî bû, çimkî sala 1995 hate nasîn wek sala Ehmedê Xanî, ji ber vê Kovara Zanîn ê hevniwîsek (melefe) bo vê babetê vekir û hezkir ku her nivîskarek gotinekê di derheqê seydayê Xanî de binivîsîn e...

Oskan di peyva xwe de dibêje:

" **Toreya te, va şana dîroke**

Zîna Cezîrî bo me tim bûke

Tê ber çavêd min ew kar û xebat

Memo û Zîne çîroka welat.

Toreya Xanî gulîstaneke firehe, tijî gul û kulîlkin, pêwîste ku em van kulîlkan bihin bikin, ta em jî bihnê bidin rûpelên vala..

Bêguman ku xama me bi Memozîna Xanî re tûje, ji ber vê yekê divê ku em jibîr nekin ku ev çîrok xwe bi xurtî li laşê miletê kurd dipêçe û xwe êşên wî têr dike, lew ez dîsan bi dengê bilind supasiya nameya (Erselan) dikim ku xwest evê salê (1995) bike sala Ehmedê Xanî, ji ber ku ev xizmetek bilinde bo toreyê kurdî.. Bi hêvî me ku ev kar berdewam bibe..."

Û werwiha di eynî hejmarê de, me pîrsek ji nivîskarên kurd kiribû, ku nerînên xwe û baweriyên xwe li ser esta Kovara Zanîn bidin diyarkirin; bersiva Arşevê Oskan wiha bû:

"Divê ku em bizanin ne dibistanek, ne pertûkxanek serbest bi zimanê me peyda dibe, ewe yên ku zimanê me bi me dide nasîn bêtir kovar û ferheng û dîwanin.

Di van salên dawî de kovara Zanîn bi bejneke bilind xwe berçavî me kir, û bi sîngeke fireh nivîskar himêzkirin, û ji hêsirê wanw çemekî bi hêz ji êş û kovan û çîrokan çêkir, awazên rengîn liser pêlên govenda xwe sazîkin û kulîlkên dil dibîşkivînin.

Bo Zanîn hêviyên pêşveçûnê dixwazin, tevî ku hêviyên min birîndarin".

Di hejmara (11) sala 1996, Hevpeyvînek ligel hunermend; Mehmûd Ezîz Şakir li darxistibû. Di vê hevpeyvînê de Arşev bi hostayî pîrsên xwe dike û di nava 11 pîrsan de jiyana hunermend Mehmûd ji destpêka weyî hunerî ta dema dwaî ji xwendevanên kovara Zanîn ê re dide diyarkirin.

Di wê demê de jî pirtûka xwe a binavê " **Hêviyên birîndar**" diweşîne, û rêkalm wê pirtûkê di kovara Zanîn de wek yek ji pirtûkên 1995 e tê belavkirin.


Evbûn berhemên Oskan di wê demê de. Lê paş re derfeta çapkirina pirtûkên kurdî çî li Sûriyê çî li welatên dîtir hatin peydakirin, û Arşev di wê riyê de çend dîwanên xwe ê helbestan weşandin û gelek caran di riya internête û malperên kurdî de gotar û helbest diweşandin, eve jibîlî kurtepeyvên ku li ser Facebookê re belavdikirin, ta ku çû li ser dilovaniya xwe. Arşev mirovekî çalak bû û hezkirê zimanê kurdî bû, bi mirna wî gelê kurd li Rojavayî Kurdistanê torevanekî xweyî bejinbilind windakir.



MÎŞÊL FÛKO

NÎTSSÊ, FREUD, MARKS

Werger û amedekirin ji Rûsî : Bêkes Têlo



Li Rojava, Mîşêl Fûko (Michel Foucault 1926-1984) filosofê fransî paş deh salan ji mirina wî ve, yê herî pîrxwêner e, yê herî gotûbêj û lêkolîn li ser kirî dimîne. Di salên 70ê de, dibe berzîr û bandortirîn kesayetiyek nav ronakbîrên Fransî û îlhamdarek bo nivîşkî bi giştî ji filosof û lêkolîngeran di warên cuda de. Îro jî Fûko ew kesê ku „me ferî ramanbûnê„ dike. Gelo çî sedema vê balkêşiyê û cudabûna wî ye ?

Berî her tiştî felsefîna wî ye : xwedî bîr û bawerî ne dogmatîk bû, ti car bersivan nade, her gav pîrsgirêkê provoke dike, her gav tûj e yan jî „pîrsgirêk dubare radixîne û vava îmkaneke vedike bo nêrînek nû li ser pîrsgirêkê, fetlînokek nû di ramanê de berz bike. Balkêşiya bi Fûko re wisa jî, girêdaye ku di warê lêkolîna filosofî û mijara wê de, rewşên neyeksane ji hebûna mirov derbasî wan kir ye. Warên ku balkêşiya filosofên pîspor li ser xwe ne kişand bû: weke dînbûn, klînik, girtîgeh, çalakiyên seksî. Warek ji wan, vebêjîyê ye ku Fûko navên cuda „vebêjîyê „ „vebêjîya ramanê„ geh jî „bi lêvîkirina tiştan„ „arşîv„ bi nav kir ye .

Û li derekê di ramana Fûko de, bi taybetî li ser vebêjîyê ku serbixwe ye, xwedî e, radiweste. Vebêjîyê Xwedî desthilatekê, xwe kontrol dike û bi rêxistin e, desthiladare li ser hemû xabatên din, bi wateya serdestbûna wê diyar dibe. Bi vê şeweyê „têgihîştina Fûko cudatir e ji piraniya hemû têgehên ziman, galgal, kod, û whd... ku sedsala 20 pê pîr dewlemend e. Di berhema jorîn de, tê dîtî hewldana xweseriya Fûko ligel herdu şepêlên berz ji ramana mirovahî yê di dema me de. Ew jî: Sîmiyotîka ye, ji hêleke ve- ku rewş weke kodên „xam„ (sade) dibîne bê şîrovekirin. Û şîrovegerî ye ji hêla din ve- ku bi rewşa şîrovekirî mukir tê û bi cîhanîna ve şîrovegerî subjektîv e destnîşan dike. Fûko xwe dîr ji vê û ji ya dîtîr dike, ne tenê bi hostetî lê destnîşana destkeftên wan jî, yê berdewam in dike. Lê destnîşana pîrsgirêkê û xapînokan ku li paş wan ramanên belengaz radiwestin, dihêle Fûko cudabûna vebêjîyê û taybetmendîya wê bîne holê weke siktorekî serbixwe be, bi mîkanîzma pê re „destpêk, pêvajoyê, belavkirin û kelm .

Gava bi ramana li darxistina vê maseya girover agahdar bûm, bi min pîr balkêş hate xuyanî kirin, tevî aloziya wê ya diyar kirî. Min hewl da xwe ji vê aloziyê derkevim bi vê şeweyê hatiwî de: Ez ê çend mijar pêşniyar bikim ku têkildana wan bi tîknîka şîrovegeriyê li ba Marks, Nîtsşê û Freud heye. Û bi xwe li paş van mijaran xewnek heye ku rojekê hevdana hemû tîknîkên şîrovegerî, yê ta îro hatine naskirin, di çapekê de an jî, di însklopêdyekê

de ji destpêka rêzimankarên Grîkiyan ta rojên me bête tomarînin. Û bawerim ta niha hin beşên girîng ji vê çapê hatiyê nivîsandin. Bo derbasbûna vê îdêyê-îdêya dîroka tîknîka şîrovegeriyê-pêwîste bête gotin ku ziman û bi taybetî ziman di çanda Îndoewropî de, tim du guman tanî holê:

Ya yekemîn ku dibêje : ziman ne wateya xwe ya raste rast ku em tîdîghîşin destnîşan dike . Lê belê di xwede, wateyekî xurtir û veşartî hildigre. Bi taybetî ev wateya xurt û „kûrtir„ Grîkiyan allegoria an jî, hyronia binav dikirin. Ji rexê dî ve, ziman weke vê gumanê jî diafirîne: ziman dikare ji sînore form û wêneya xweyî ya bi lêvîkirî derbas bike. Di cîhanê de pîr tişt diaxivin bêyî ku ziman bin, siruşt weke dibêjin (derya, xûşxûşa pelên daran, lawîr, rû, maske, xencera neqîşkirî) dibe ev zimanekî bi lêvîkirîkî dîne „ne xwedî taybetmendiyê devkî be. Em dikarin têgeha Grîkiyan semainon bi karbînin. Ev herdu gumanan ser destê wan hatibûn nû derhênandin û ta niha jî, ji holê ranebûne .

Ji destpêka sedsaliya 19 ve, me ji nûve derhênand livên lal „milodî û bi giştî ev şûmiya hawîr dora me ku bi hêze bo axaftdar be û bi taybetî îro bêtir ji hemû deman ve, em dorpêckirî ne bi guhdariya vî zimanî bin, û hewl bidin vekolîn ji paş peyvan galgalekî din û watedartir derhênin.

Ez bawerim, her çand an jî, bi taybetî her formekî çandî di şaristaniya Rojava de, xwedî sistêmekê şîrovegerî, tîknîk û mêtoda xwe bû. Xwedî şewazên xweyî taybetmendî bû û guman dikir ku ziman dixwaze tiştêkî dîtir bêje ji bilî tiştên ku dibêje û guman dibû ku zimanekî dî heye ji bilî zimanê xwe ê destnîşankirî û bi nêrîna min pêdivî heye bi avakirina sistêmekê (an cedewleke weke di sedsala 17 de dihat gotin) bo van hawan ji şîrovegeriyê re.

Ji bo têgihîştina vê sistêmekê ku di sedsaliya 19 de hatibû sazîkirin, û bo em bi zanîbin di kîjan sistêma şîrovegeriyê de ne, pêwîste di bawerîya min de, em li nêrîna bi serde çûyî veşerî û ji bû vava em ê weke mînak „modêlek ji tîknîka ku di sedsaliya 16 de dihat xebtandin bi karbînin. Di vê çerxê de, tiştê şîrovegerî bi çarçofe dikir û zêviyê giştî yê li ser çalakî dikir teşbîh (mînahev ??.. wergêr) bû (resemblance). Li wira tiştên mînahev li kû bana tenha li wira wate hebû an tiştêkî divyaba bête gotin „paş re bête dişefre kirin . Pîr nase ew rola ku têgeha teşbîh (mînahev) lîstiyê û hemû têgehên hevrê ne pê re, di kosmolojî (zaniyara gerdonî) de, di botanîkê de (zaniyara gîya), di zolojî yê de (zaniyara lawîran) û di filosofîya sedsala 16 de. Û bi rastî ev mînahevên tevlihev di nêrîna mirovê sedsala 20 de, tevliheviyê, bê rêxistinî jêre diyar dibe „lê bi xwe mîkanîzma mînahev ya sedsaliya 16 an, xwedî rêxistînek pîr xurt bû û bi kêmanî pênc têgehên bi sînorkirî hebûn:

-Têgeha li hevîkirin, an jî, li hevhatî (conventia) mîna li hevhatina henas û laş, li hevhatina di neqeba hin hawîran û hin gîyan de .

-Têgeha sympatheia bi wateya symptom û yekîfyay



wan rûdanan di naverokên cuda de.

-Têgeha Emulatio, rengeke ji paralêlbûna rengdêran di materyalek an di meteryalên ne yeksane de, weke ku rengdêrek bervajeya rengdêrekî dîtir bike (wisa *Port destnîşana li rûyê mirov ku wî dabeşî heft beşan dike, ew bi xwe ezman û her heft kewkebên ezmanî bervaje dike) .

-Têgeha singnatura (mor) yek ji taybetmendiyên takekesane, dîtware „tê naskirin weke rengek veşartî ji hin taybetmendîya wî . Ya dawî têgeha analogiya bi wateya nasnameya pêwendiyên neqeba du an bêtir ji naverokên ne yeksane. Welê tîoriya signe (nîşan „kod) û tîknîka şîrovegeriyê di vê çerxê de hatibû sazîkirin di caroveyêke pîr ronî bo hemû mînahevên muhtemel û du zanîstiyên cuda dixwest : cognition bi wateya wergirandina serû (sethî) ji mînahevekê bo ya dîtir . Û Divinatio bi wateya zanîna bi kûrahî ku tê wergerandinê ji mînaheva serû bo mînahevek kûrtir. hemû ev mînahevên cûr bi cûr di bîngê de li hevhatînek di cîhanê de tanî holê ku beramberî wê mînaheva „simulacrum- bû ya ji rêderketî , ku ser bîngê dibêjberî di neqeba yezdan û şeytan de avadibû.

Ger pêşveçûna ramanê li Rojava di sadsaliya 17 û 18 de ji vê tîknîka şîrovegeriyê bê par mabûn, ger rexneya Beykon û Dîkart ji mînhev re rolek lîst ku wê tîknîkê di nav du kavanan de hiştin, sedsaliya 19 berî her tiştî Marks, Nîtsşê û Freud li pêşya me îmkaneke nû ji şîrovegeriyê re vekirin. Û îmkaniya tefsîra deqên kevin yê pîroz damezirandin. Berhemên weke pirtûka yekem ji „sermeyan„ (kapîtal) û „rojîbûna trajêdiya„ „çavkaniya moral„ û „şîrovekirina xewnan„ me rû bi rû bi tîknîka şîrovegeriyê dihêle û bandoreke bi şok ji me re anînin van berheman, li ber çavên me weke Marks bi xwe nav lê dike „hiyeroglîfan „li ber me berz kirin . Vava me birîndar dike, ji berku van tîknîkan bi me ve girêdayî ne, ji ber em bi alîkariya wan tîknîkan, em xwe şîrovedikin . Lewra pêdivî heye bi alîkariya wan tîknîkan em Marks, Nîtsşê û Freud weke şîrovegeran şîrove bikin. Û bi vî rengî em xwe bervaje dikin bi lîstîkekê bê dawî di eynikan de. Ferud gotibû ku li cîhekî di çanda Rojava de sê birînen nêrgizî hene:

Ya yekem Kobîrnîk e, duwem birîna li ser destê Darwîn pêkhatiyê gava nûderhênand ku bîngê mirov ji meymonan e pêşkêşî me kir. Û sêyem Ferud bi xwe ye çimkî nûderhênana wî ya ku dibêje bîngê hiş li ser bê hişiyê avadibe.

Û ji xwe pîrs dikim : gelo nabe bê dîtîr ku Marks, Nîtsşê û Ferud me bi şîrovegeriyê dagîrkirin, ew şîrovegeriya her gav xwe berovaje dike „li dora me an jî , bo me eynikan avakirin . Wênayên tede weke em dibînin , ji mere şermezariyê ne jî bîrkirî ye, û bi taybetî ev e nêrgizîya me ya ku îro pêktê?.

Di her hal de, min dixwest çend boçûn li dorê vebêjîyê bîjim. Bi min welê diyare ku Marks, Freud û Nîtsşê hejmara kodan li Rojava zehf nekirin e . Tu wateyekî nû ne dane tiştên berê ku bê wate bûn, ewan tenha xwezaya kodê û awayê ku kodê pê tê şîrovekirin, guhertin . Pîrsa yekem ku li vira dixwazim gotûbêj bikim : gelo raste Marks, Freud û Nîtsşê wisa bi kûrahî atmosfêra belavkirina kodan guhertin, ew atmosfêra ku kodê tede dibe kod ?.

Di çerxa ku wê weke vegere min destnîşan kir bû, sedsala 16 -an „kod bi hemojenî belavkirî bû, di atmosfêrekê de ku ew bi xwe hemojen bû di hemû aliyên de, kodên qad li ezman divegerîyan, wisa bi



serkeftî jî, di cîhana bin qadê de. Kod dikaribûn bîn sipartin ji mirov ber bi dewar ve, an jî, ji dewar bête rêkirin ber bi gîya ve û berovajî. Ji destpêka sedsaliya 19 ve, bi destpêka Ferud, Marks û Nîtsşê kod di atmosfêreke pir neyeksane kindirî ji rexê kûrahî ve – ger kûrahiyê ne weke tiştêkî ji hundirîn bête têngîştin, lê berovaje, weke ku ji jîderve be. Bi taybetî li vira li ser gotûbêja ne rawestyayî ramandibim ya ku Nîtsşê bi rêvedibir ber bi îdêya kûrahiyê ve. Nîtsşê kûrahiya îdyalîzekerî û kûrahiya hişyarî rexne dike .wê weke xapînoka fîlosofan radihgîne. Ev kûrahî her gav weke lêgera hundirîn bo rastiye dihat pêşkêşkirin .

Lê Nîtsşê wê weke kûrahiya ji destçûn, xapînok û veşartî destnîşan dike. Lewra gava şîroveger kodên vê kûrahiyê lêger dike ji bo wan derxe rohnîyê, pêwîste dakeve xwarê bi rengêkî ber bi jêr ve (vertîkal) û xûyanî bike ku ev kûrbûna hundirîn , di rastiye de, û bi gelamperî ne ew tiştê ku ji me re dibêje. Û bi vî awayî şîroveger pêwîste weke Nîtsşê dibêje : „bingehan baş bikole,,

Lê di rastiye de, ev rêçika ber bi xwarê ve, tê derbaskirin, tenha bo veğerandina wê serû (setih), ya dibiriqîne ku veşartî û temirîye. Bi wateya ger şîroveger û pêwîste bi kûrbûn di „kolandina,, xwe de, bi live ,êdî bi xwe tevgera şîrovegeriyê- weke hewldana ber bijor ve ye, û di bin xwe de kûrahiya radayî dihêle, wired wired zehf dîtwer dibe. Niha kûrahî tê dîtin weke poxê serû be, û bi vî rengî, firîna laçîn û hilkişbûna çiya û ev hemû vertîkalbûn girîng in di „Zaradosta,, de- bi peyvekî hûrbînî ev berovajebûna kûrahiyê ye û derxistina rastiye ye, ku kûrahî weke lîstikeke, tawandinek ji tawandinên serû ye, û her cîhan bêtir kûr be, li ber meyzandinên me, hewqas dîtwer dibe û hemû kûrahiya mirov ne tiştê e, ji bilî lîstika zarokan pêve.

Pirsdikim, gelo nabe em berhevda (muqarene) - tevî cudahiya diyarkirî - bikin di neqaba wargeha vê lîstika ku Nîtsşê bi têgeha kûrahî ye ve bi rêvedibe, û lîstika ku Marks bi têgeha,, kesixî ,, (tefahet) bi rêvedibe. Ev têgeh li ba Marks pir girîng e, di destpêka „sermeyan,, de , diyar dike ku pêdivî heye bikeve nav mij bo destnîşan bike ku tu sawîr û sîrprîz nîne ji kûrahiya têgeha Burjiwa bo peran, sermeyan û bûhayê re û di rastiye de, hiç tiştê li wira nîne ji ,, kesxûn,, pêve.

Bê guman hêjayê gotinê ye, em warê şîrovegeriyê bi bîrbînî, derhênana Ferud û ne tenê di tîpologiya wî de ya bi navûdeng „hiş û bê hiş,, lê bingeh û dispîlnên ku pêwîst in hişyarîya psîxanalîzkar birêve bibe, yê alîkar in pê re bo disşefrekirina galgalên nexweşvan di „zîncîr xelesa,, axaftbûyî de. Wisa jî hêjaye bi bîrbînî wargeha madî ku li ba Ferud girîng e, ya bi bandorê li nexweşvan ber meyzandinên psîxanalîzkar .

Mijara duwem ku dixwazim pîşkêşî we bikim, her bi xala yekem ve girêdaye. Û destnîşan bikim ku ji destpêka Marks, Nîtsşê û Freud çalakiyên şîrovegerî bû karekî dawî jêre tune, naqed e. Ta di sedsaliya 16 de jî, şîrovegerî bi bê dawî bû, lê wê çaxê kod li hev vedigeriyan, tenha ji ber pêwendiyên mînahev (teşbîh) a bi sînokirî. Ji destpêka sedsala 19 ve, kod bi hev ve dihatin girêdan, bi zîncîr xelegeke bê dawî , ne ji berku mînahev li vira bê sînor bû, lê ji ber li wira tim vekirîyeke û qolên ku nayên girtin hene. Ne qedandina şîrovegerî û mabûna wê dubare li ber çav derbaskirî re , û mayîna wê weke şîrovegeriyêke dâliqandî, em li ba her sisy an Marks, Nîtsşê û Ferud

bi rengêkî weke hev e dibîbin.

Raman ku dibêje şîrovegerî berî kod peyde dibe an jî, li pêşiyê ye, wisa di xwe de, dide xûyanî kirin ku kod ne xwedî xwazaya hêsan an jî, naverokêk dilpakîyê ye, weke di sedsala 16 an de, dihat lê nêrin. Tenha ji sedsala 19 ve bi destpêka Marks, Nîtsşê û Ferud , şîrovegerî dest ji dilpakîya xwe diqere, bi wateya tamirandin bi rengêkî mijkirî, weke rengêk ji ne dilpakîyê tê bi cîkirin .

Kod- şîrovegerî ye, ku hewl dide hebûna xwe bi behanê bike û ne berovajî. Wisa ye karê peran li gor „rexneya ramyariya aborî ,, û bi taybetî pirtûka yekem ji „sermeyan ,, û bi vî şewazî jî, symptom li ba Ferud tevdigere. Lê li ba Nîtsşê peyv û wekhevî, tendûtûjî neqeba pakîyê û xirabiyê ye.

Bi vî rengî kod ne tiştêke ji bilî rûçadir (maske) pêve, bi wergirtina rêkîroxa nû – veşartina an temirandina şîrovegerî – kod naveroka hêsan ya xwe winda dike, naveroka nîşandêr bûyî.

Kûrahiya wê ya taybet vedibe, û di vê qolê de têgehên nerênî destpêk dikin ku bo tîoriya kod beyanî ne. Wisa di atmosfêra kodê de, îhtimala îmanên lîstika têgehên nîgatîv dertê holê ji dijberî û tendûtûjî.

Û di dawiyê de , zirta dawî ji şîrovegeriyê : şîrovegerî ji ber bê çarebûnê, ta bê dawî xwe şîrove dike, tim li xwe vediger e. Bi vî awayî du encam hene : Ya yekem, şîrovegerî pîrsa „kî ? ,, radixîne, çimkî ne wate tê şîrovekirin lê ev pîrs tîkirin kî şîrovegerî bi karanî yê? . Ya girîng di şîrovegeriyê de- şîroveger bi xwe ye, tu şîrovegerî nîn e bê şîroveger û dibe ev wateya ku Nîtsşê da pey va ,, psîxolojî,,

Encama duwem, dibêje ku şîrovegerî neçar e xwe, bi xwe şîrove bike, nikare bireve ji veğera xwe şîrovekirinê. Dema şîrovegerî giroverî ye, cudaye ji dema kodan ya bi sînor e, tevî ku dema gotûbêjê xêzekî ye (bi wataya xêzek panbûnê... wergêr). Dema şîrovegerî niçare careke din ji cihê derbas bûyî derbas bibe. Ji ber welê metirsînek tê holê- metisîna mirinê –êrîşî şîrovegerî ye dibe û bi xwe ev tiştêkî seyre ku ev êrîş dibe ji aliye kodan. Bawerbûna bi hebûna kodan beriya şîrovegeriyê weke tiştêkî resen û rast be, bo şîrovegerî mirin e. Jiyan jêre berovajî ye, ku tenha şîrovegerî heye. Bi ya min gerek têngîştinek baş hebe, îro pîr kes vê jîbîrdikin ku: şîrovegerî û sîmiyotîka dijmin in hev in yê mirinê ne. Şîrovegeriya ku xwe dispêre sîmantîk hebûna kodan ya bê dawî mukir tê, xwe dûrî van pesnî şîrovegeriyê dike weke kelemçebûn, neqedandin û bê dawîbûn. Têde tîrora wateyê diyare û guman bi ser ziman diçe. Li vira em baş Marksîzm tîdigîşin û paş Marks çî pê hat. Lê şîrovegerî berovajî ku xwe disperse xwe û di hundirê ziman çalakî dike û ji hev qutnabe tim bi hev girêdaye û li vir cuda dibe dehbebûn û zimanê baqij. Û li vir em Nîtsşê dibînin.

GOTÛBÊJ

BEM

Bi rastî we şîrovegerî li ba Nîtsşê ku nayê rawestandî baş diyar kir, ji bilî vê jî, ravekirina,, cîhanê ,, û ,, guheratina,, wê eynî tişte li ba Nîtsşê, gelo li ba Marks wisa ye? .Di deqekî navdar de, guhertina cîhanê û şîrovegeriya wê dijberî hev datîne.

FÛKO

Bi rastî ez li hêviyê bûm ser vê derbirînê dijberiya

hin bibînim bo vê hevokê, ger we bala xwe dayê be, Marks di pirtûka ,, aboriya ramyarî,, çî dibêje, hûn e bibînin wê weke awayeke ji şîrovegeriyê bi kartîne. Ew deqê ku we destnîşan kiriyê li ser şîrovegeriyê, girêdaye bi fîlosofiya û dawîya wê ye ,lê dibe tîkildare be bi aboriya ramyarî weke Marks tîdigîşe .

TOB

Bi baweriya min analîza we kême, we tîknîka şîrovegeriya olî û pêşketina wê ya dîrokî we ne şopandîye .Bi min şîrovegerî ji sedsala 19 ve bi Hîgil re destpêkirîye.

FÛKO

Ez li ser şîrovegeriya olî ne rawestyam ligel girîngiya wê, çimkî bi kurtî min dîroka kodan pêşkêş kir, ez alîgirê kodê me, ne alîger ê wate me. Pêwîste em dîroka fîlosofiya û kolandinên pênasîne tevlihev nexin .

VATÎMO

Ger ez rast ji we têngîştim, gerek Marks tîxin rêza ramankarên mîna Nîtsşê ku şîrovegerî bê dawîbûn dibînin. Lê li ba Marks tevî wisa noqta dawî heye, ma ,,bingeh,, çî ye ger ne tiştê weke asas bête dîtin?

FÛKO

min hîn nêrinên xwe baş li ser Marks ravenekirîye û ditirsim niha jî, nikaribim Marks tu car şîrovekirina xwe weke ya dawî pêşkêş ne kiriyê, ew baş dizane û dubare dike ku: her gav dibe şîrovegeriyêke kurtir an asteyêke bi gelemperî bilind ji şîrovegerî ye bête dîtin, û nîne tu şîrovegerî li ba serû raweste.

DEMOBÎN

We li ser Nîtsşê ezmûna ,,dehbebûn,, ê anî ziman, weke ya herî nêzîktirîn xal ji pênasîna bê dawî be, karim ji we bi pîrsim di kijan rexî de bi nêrîna we de û çawa Nîtsşê vê ezmûna dehbebûn bi destxistîye? em ê pîrs bi sînor bikin li ser Nîtsşê. gelo mebseta we ,ev bû?

FÛKO

Erê.

DEMOBÎN

Dibe we dixwast bêjin ,,dehbebûn,, yan ,,hest,, û ,,texmîn,, a wî, ji ,,dehbebûn,, re? gelo bi rastî hûn bawer dikin ku ramankarekî bi asteya Nîtsşê karibe binase ezmûna ,,dehbebûn,, ê?

FÛKO

Ji we re erê dibêjim.

KELKEL

Pîrsa min ew ê kurt be. Bi mijarê tîklav e, ku we navê ,,tîknîka şîrovegeriyê,, lê kiriyê gelo hûn bawernakin ku ev tîknîk bi xwe tîknîkên ,,êşbir e,, weke êşbira takekesane li ba Ferud e, û êşbira mirovahiyê li ba Nîtsşê ye, û êşbira civakê li ba Marks ?.

FÛKO

Erê. bawerim, wateya şîrovegeriyê di sedsala 19 de, nêzîkî vê wateyê bû ku we navê êşbir lêkir. Di sedsala 16 de , şîrovegerî wateya wehî û felat distend, li vir dixwazim hevoka dîroknas ,,GARSYA,, ya sala 1860 nivîsand bû, bînim ziman ,,di rojên me de tendirûstî cihê felatê wergirtiye ,, .

Feqeyê Teyra

DÎLBER

- 1 -

Ey Dîlbera gerdên zerî,
Way nazika dêm qemerî,
Qamet ji mûma fenerî,
Wêran ezim, malim xirab.

Ey Dîlbera gerdên letîf,
Way nazika qamet elîf,
Qamet ji reyhana xefîf,
Wêran ezim, malim xirab.

Ey Dîlbera gerdên zuzac,
Way nazika mislî zuzac,
Qamet ji reyhana qirac,
Wêran ezim, malim xirab.

Ey Dîlbera qamet misal,
Way nazika dilî hejar,
Te ji xandinê kirim betal,
Wêran ezim, malim xirab.

Ey Dîlberê, way Dîlberê,
Firyad ji destê keserê,
Avik ji ava Kewserê,
Wêran ezim, malim xirab.

Ey Dîlbera gerdên zirav,
Dêm şûşeye, tijî gulav,
Ey duxtera bejna zirav,
Wêran ezim, malim xirab.

Çavan ku hiltînî bi meste,
Ew çend ya misrî bi deste,
Li kuştina min te bi qeste,
Wêran ezim, malim xirab.

Tu bi qesta min dikujî,
Tu bi k'ifra di nosojî,
Gelek sotim kirim rijî,
Wêran ezim, malim xirab.

- 2 -

Gelek sotim, kirim kşibab,
Kiryê bi min, sed reng xirab,
Ya leytenî kunrû turab,
Wêran ezim, malim xirab.

Ya leytenî kunrû ve xar,
Wey nazika min te ji dûr,
Bêhiş kirim zilfê di hûr,
Wêran ezim, malim xirab.

Bêhiş kirim zulfê du reş,
Biskê siyah, bîhnê di xweş,
Ey duxterê, çapik bi meş,
Wêran ezim, malim xirab.

Bêk'êf kirim zilfê du reş,
Biskê siyah, zilfêd qemer,
Eşq û muhbeta min li ser,
Wêran ezim, malim xirab.

Sotim, biraştim bê hesab,
Lê pirsî bo kirme k'ebab,
Kiryê bi min sed reng ezab,
Wêran ezim, malim xirab.

Sibhan ji şahê bi tenê,
Xalik li xala gerdênê,
Ez dîn kirim berdam dinê,
Wêran ezim, malim xirab.

Eşqa mezac peyda bûye,
Îro li min dijwar bûye,
Hîvî dikim heqîqiye,
Wêran ezim, malim xirab.



- 2 -

Min ah ji dest kovan û qeheran min sebir nayêt li seheran
Şûbehê mawcên di behran qulzemê umman im ez

Qulzem û behrên di heftê agirê eşqê ku keftê
Dê bisojit mislê niftê min dîye, pê zanim ez

Min dîye muhbet çî reng e sohtime doja pir-ye`ke
Min mudam dil ji biheng e bi nalîn û efxan im ez

Nalîna teyr û tuyûran kalîna çeng û bilûran
Xulxulên di qesr û qusûran bulbulê xoşxan im ez

Bulbul um daîm dixwînim ez yaqîn ez te bibînim
Dîn dibim sewda di mînim serxoş û sokran im ez

Serxoş û ebter kirim te ji îlleta rengzer kirim
Te sotim û ker ker kirim tu agir î buryan im ez

Agir û pêta di dil da me`neyan daxan ku hilda
Ew kitib naçit du cilda hafizê medhan im ez

Hafizê medh û pesendan rohiya mehbûb û rindan
Bê hesab werbûn di fînda sotîyê bê can im ez

Soti me qet pêt û nar ne kuştî me der b lê dîyar ne
Min demek sebr û qera ne nexweşê pir-jan im ez

Nexweşê reng lê nemayî dest li se falê nihayî
Wan digot ji çavê gihayî kûştîyê e`nran im ez

Kuştîme her do`ûyûnan yan kî yêd nisbet ji nûnan
Radikit ew qetl û xûnan girtiyê zindan im ez

Girtî me insaf di mîr ne qazi û mufti ve bîr ne
Qeyd kirim kes bê xebîrne bendeyê hicran im ez

Ma di benda firqa te canfidayê xidmetima te
Da bibînim rehmeta te nobedarê xanim im ez

Nobedarê qullehê xo dergevanê derqehê xo
Bîne bîr û agehê xo tûleyê asîtan im ez

Çavrêyê sirra li pêş im meqseda ezlê feniş im
Hicreta Yûsuf dikêşim Ye`qûbê Ken`an im ez

ÎRO JI DESTÊ HUSNA hebîbê

- 1 -

Îro ji destê husna hebîbê sergeşt û heyranim ez
Min eşqê û muhbet bûn nesîb sewadê sergerdan im ez

Eşqê gelek sewdakirin bê mal û bê mewda kirin
Nûra çira winda kirin Mûsayê Îmran im ez

Mûsa ji destê husna bi nûr şêrînîya xalê di hûr
Secde bire ber kohê Tûr nêzîkê remza wan im ez

Remza ku dê dîlber bikin carek bi çêşman seyr bikin
Dê kohê Qaf ker ker bikin mecrûhê pir-kovan im ez

- 3 -

Kor e bo Ye` qûb ji dînê j` perdeya daxa evînê
Ger di bê veke birînê hewceyê Lokman im ez

Wan digot Lokman tebîb e gote min xef ` endlîb e
Şarifê derdan hebib e pê bawer û iman im ez

Sond dixwin sa` id û destan kevir û şeylêd li bestan
Min bi xom li curhan bebestan be rahet û asan im ez

Aşîqa rahetya kê m eagir û pêta dilê me
Çend hezar medhên dibê me muhîtê esman im ez

Xwezî min sed ser hebûna sed hezar dev pê ve bûna
Ew hemûl` medhên te bûna hêj bi wan niqsan im ez

Ez kiz û zer bûm ji qehrê dê devêk çibikit jibebrê
Yan du çav çibikin ji seherê bê dîtina eynan im ez

Sed hezar çav min divêna bayekî perdan hilîna
Xet û xal min têr didîna eşqa qutî can im ez

Feqê Teyra



Feq alavêk ji alavên aw û nêçîrê ye. têla ku ew jê tê çêkirin du mîlî ye, wek çawa du fekên devî mirov hene, her wisa du fekên devî feqê jî hene, fekên wê wek kevan û qentirman xar û qilûç in, ji jêr ve jî destikê xwe heye. Ji bo ku feq bê çerandin, rasor yan jî zimbelek li dor herdu fekên feqê tê alandin, têla ku zimbelek jê tê çêkirin ji têla fekên feqê ziravtir e; lê jê sertir e, zimbelek li dor fekên feqê ji jêr ve tê alandin, pêre herdu aliyên têla zimbelekê, yê destpêkê û yê dawiyê her yek bi fekek feqê ve tê girêdan, belê ev jî dê şiyana neyênî û erênî(positive and negative) peyda bike, û dema ku ew hêz peyda dibe, pêvajoya çerandinê çê dibe, ango feq jixweser tê hevdu.

Çerandinê feqê qonaxa tev dawî di nêçîrê de ye, nexwe û ji ber ku feq li ber çivîkan vekirî bimîne, zîvareke biçûk bi feqê dixin, û jê re dibêjin dîlpik, dîlpik jî ji şivên mêmên tirî tê çêkirin, ew ji hundir ve tê quqilandin ango hundirê wî vala dibe û deziyek tê re derbas dibe, dezi jî bin ve dîlpik bi feqê ve diçespîne, û ji ser ve kurman jî kulî dikevin ber, belê ev jî xwarina ku çivîk pê tîr girtin, navenda dîlpik ji derve ve, tê kêrtkirin, ev kêrtî jî ji bo ku qulpikê bi destikê feqê ve girêdayî di ber keve, û wexta ev qulpik dikeve ber dîlpik, ev pêvajoyê herdu fekên feqê vekirî dihêle, ji ber ku dema qulpik bi dîlpik dikeve ew di ser feka jêr re tê cem dîlpik, û wexta ku çivîk tê xwarina ber dîlpik bixwe û ji ber hejandina dîlpik ew ji ber qulpik difilite, belê filtandina qulpik û şûnve-vepekandina wî, feka feqê azad dike, a ku ji alî xwe de diçe cem hevvala xwe, her wiha wexta ku tê çerandin, stû an jî laşê çivîkê bi xwe re dibe û di nav xwe û hevvala xwe de digire.

Xwarina ku dikeve ber dîlpik jê re dibêjin şûk, ew ji xweştirîn xwarinên ber dilê çivîkan e, ew jî yan kulî ne û yan jî kurmên sipî ên ku ji nêrxendiyên hişkbûyî tîr derxistin, ji bo xwarina ber dîlpik pir bala çivîkan bikişîne, heya çar kurman dixin ber dîlpik, ji ber ku, kêlîka ku qulpik bi ber dîlpik dikeve, deziyek ku kurman di berda ne sert dibe û sertbûna wî canê kurman diêşîne, belê çiqas canê kurman biêşe ewqas dilebitin û xwe dilivînin, û çiqas xwe livandin ewqas bala çivîkan dikşînin ku bîr wan bixwin.

Axîna te nalîna min

- 1 -

Axîna te nalîna min
Erdû asîman pir şî n e
Gulê ez canê te karvan
Mame wek kalek hilhile


Ez digirim li vê dinê
Sebra dilê xwe nabîni m
Ka delala min bidin min
Min bi tiştan nexapînin
Geh dikevim geh radi bim
Ez pêşiya xwe nabînim

Dil birîn e dil axî n e
Bidin ronîya çavên min
Bidin ronîya çavên min

- 2 -

Gelo çima hun serdest in
Em bindest in li vê dinê
Ez digirim li vê dinê
Sebra dilê xwe nabîni m
Ka delala min bidin min
Min bi tiştan nexapînin
Geh dikevim geh radi bim
Ez pêşiya xwe nabînim

Dil birîn e dil axî n e
Bidin ronîya çavên min
Bidin ronîya çavên min



Li kêlek kurman, xwarina din a ber feqan kulî ne, Digel ku pir cureyên ciyawaz ên kulîyan hene; lê cureyê tev baş û hevaz, kuliyê pazik sor e. Berejavî peydakirina kurman; peydakirina kulîyan hinekî zehmet e, tu yê dî tîna rojê de li wan bigerî, ji ber ku ew ne danê sibê û ne jî danê êvarê derdikevin, heya ku te yek dît jî tu yê pir bi pey wî bikeve heya tu bigirî, ji ber ku ew cureyê kulîyan pir hişyar e, ango dema te dibîne, ew pir bilind hildipeke û direve, û her hilpekînek û xweçekirinek dora deh heya bîst mitran mewdayê dibe.

Li dawiyê kin dirêj, piştî ku kulî tê girtin, berî her tiştî lingên wî tîr hilqetandin bo ew nikaribin bifirin û birevin, tenê bergê ser pazikên kulîyan dimînin, ji ged û taybetmendiyên kulîyan e, ku dema tu kepira wan diguvisî, pazikên wan jixweser rep dibin û li banî disekin, lewma wexta ku kulî dikin ber dîlpik deziyek dîlpik di ser kepira wî re dibin, û me got wexta ku qulpik bi ber dîlpik dikeve dezi sert dibe û di encamê de kepira kulî tê guvaştin, her wiha pazikên sor û piriqî li banî wek agirekî dadayî xuya dikin, em ji bîr nekin ku bergê li ser pazikên sor berî ku kulî bikeve ber dîlpik rasterê tîr hilqetandin, çima, cimkî dema ku kulî nû tê girtin, eger berg bîr hilqetandin dê pazikên sor biçelmsin û nema pêre rep bibin.

Piştî ku feq tê amedekirin, ew li ber kêl û telakan tê venandin, li vir zîrekiya ew kesê ku feqê vedine derdikeve holê, ango gerek ew çavdêriyê bi sebr û saman bike, gelo cihên ku çivîk pir lê dihewin li kuderê ne?, kêl û telakên baş kîjan in ...hwd. Dibe cihên ku nêçîrvan nîşan bike, hecek, dirî, belan, girê axê bin ..hwd. Heke feq li ser rûyê zemîn û erdê bê venandin, gerek ew bi komêk axa hûrik bê veşartin, û tenê şûk li derve bimîne, lê heke feq li ser daran an jî hecan bê venandin, ew di nav pelên wan de tê veşartin.

piraniya çivîkên ku feq li ber wan li ser erdê tîr venandin, çikçiko, gabelek, fînt, tîtî, copal, çokreş...hwd, ema feqên ser daran li ber çitan tîr venandin, nemaze, çitên hejîran û ên tirî.

Der barî çivîkên ku feq li ber wan li ser erdê tîr venandin, pêvajoyêkê pir girîng heye, jê re dibêjin yaldan, yaldan jî ji bêjeya alîdan yan jî bi aliyekî de bajo hatiye, di yaldanê de nêçîrvan dê çivîkan bi fîtkirinê an jî bi kişîrinê bereve telak û kêla ku feqa xwe li ber venayê bide, her wiha heya ku çivîk kurman jî kuliyê di ber feqê de bibîne. Hêjayî gotinê ye ku ne hertim çerandinê feqê berdare, pir caran çivîk xwarina ber feqê dixwe bîyî ku feq biçerpe, û pir caran heya ku biçerpe jî, çivîk yan nakevin ber feqê yan jî xwe rizgar dikin, lê rêdan û pêkana westandina wan hertim rêjeya bilind distîne.



Ji folklore kurdî

Jinik û Şêr

Daneheva: **Ahîn Zozanî**

Dibêjin jinek li gundekî hebû.

Ew jin herdem bi gilî û gazin bû, pir perîşan bû, radibû û rûdinişt digiriyê, kê ji gundiyan wê didît jê re digotin çima wisan tu xemgînê herdem bi kul û derdî?

Bi keser li wan vedigerand û digot: ez bextreş im, min xêr ji jiyana xwe ne dît!

Rojekê ji rojan, cîranek pêrgî wê hat li ber bîra avê û jê re got porkurê rewa di te de nemaye, tu mîna xezalekê bû, me digot wa gula buharê ji wir hat, ka ew bejin û bala te, çima tu roj bi roj mîna mûmê dadwerivî, ka ji min re bibêje çi bela te ye?

Jinkê bi dilekî şikestî û gewriya wê tije girî di ber xwe de diponije lê vejerand:

Ma wê çi bela min be cîranê!

wey te serê min xwarê, ma min jî mîna bûkan xêr ji mêrê xwe dîtîye, şev û roj xircir e, herdem şerê me ye, diyar e ko ew ji min hez nakî!

Dema wê wisan got, cîranê jê re got dermanê te li bal şêx e!

Wê hingê jinkê wek ko jê bawer nekir, hema bilez xwe avêt kirasê wê û jê re got: Ez di bextê te de, ka rîya şêx nişanî min bide!

Cîrana wê jê re got wê şêx dev girêdanekê ji mêrê te re çêke, wê bihêle mêrê te bibe mîna hungulisekê di tiliyên te de.

Jinkê da dûv cîrana xwe, dibêje ez di bextê te de ka navê şêx bide min?

Cîrana wê got ji xwe re bipirse ji hinan tê bi ser rîya wî vebe!

Vêca jink dibe wek miriyê ko nuh serê wî li kevir dikeve, li xwe hay hat û bû bi xwe re diaxive, dibêje gerek ez jî li bextê xwe bipirsim, divê zû xwe bi ghînim vî şêxî, çûna bal şêx jê re dibe derdek, nema dizane razê.

Radibe derdikeve ji malê diçe ji gundiyan dipirse kî mala şêx nas dike?

Xelk nizanin çi mersela wê ye, yek ji gundiyan jê re dibêje xanim mala şêx, li filan gundî ye! Jinik jî bi kêf jê re dibêje spas lawo de here Xwedê miradê te bi cih bîne.

Jinik diçe mala şêx dema derbas dibe, xwe davêje dawa şêx û digrî, jê re dibêje şêxê min ez di bextê te û ûcaxên te de, tê bihêle mêrê min ji min hez bike!

Rebenê şêx istexfariya xwe tîne, çiqasî jê re dibêje ez nikarim qîza min here Xwedê we bi hev şêrîn bike, jinik hey digrî û doza dev girêdanekê dike da ko zilamê wê jê hez bike.

Ew nizane ko ev şêx ji Xwedê ditirse û bawerîya wî bi van hawa nayê!

Lê şêx xelasa xwe ji destên jinkê nabîne, ew jî şêxekî pir belengaz e.

Ji bo ko wê ji ser riwê xwe bide alî jê re dibêje keça min îşê te pir zahmet e gereke tu porekî ji şêrekî ji min re bînî ta ko ez karibin miradê te bicih bînin!

Jinik ji kêfa direve derve di hayê wê de wisan hêsan e porê şêr bidest bixîne.

Dema diçe derve şêx derî digre dibêje here Xwedê rîya rast bide ber te.



Jink bi rê de li xwe hay hat, heylo ka wê ji kû porê şêr peyda bike û kî diwêre nêzîkî şêr bibe. Dîsan riwê jinkê zer dibe, xemgîn dibe, dest bi girî dike.

Pîrejinek ji wî alî de bal wê de tê, dilê wê xweş dike wê haş dike, jê dipirse: Keçko çi bela te ye?

Ew jî derdê xwe jê re dirêse û çîroka xwe bidawî kir û got pêdiviya wê bi porekî ji porên şêr heye û nizane wê çawa peyda bike.

Pîrê jê re got keça min rabe negrî, li wê daristanê şêrek heye, here ji xwe re porekî bîne.

Jinik dibêje şêr wê min bixwe, ez newêrim!

Pîrê jê re dibêje gêjê here, lê nêzîkî wî nebe, her roj jê re hêteke berx bibe, bavêje ber wî, ew were û ji destê te bixwe, tê karibî nêzîkî wî bibe.

Û dikarî porekî wî bibî.

Jinkê gotina pîrê xist serê xwe û berî da malê, baxek gurand û ji bo şêr amade kir.

Dema nîvroj bû, temûzê av di kûz de dikele, kes nikare serê xwe ji germa rokê derxîne.

Jinik dikevê kezeba rê de berê wê li daristanê ye, goşt dibe ji şêr re wek ko pîrê jê re got kir. Çend rojek bihurîn şêr nêzîk bû, bi çavên aramî li jinkê dinerî û goştê xwe dixwar û li tenişt wê mexel hat, zik têr e dunya germ e şêr ket xeweke giran de, jinik jî destê xwe di ser wî re dibe, wî dilorîne, hema bi dizî porekî ji porên şêr radike û bi lez xwe ji daristanê dişemitîne. Berê xwe dide mala şêx, ji kêfa lêvên wê naçin ser hev, dema dighê bal şêx dibêje şêxê min, va ye min porek şêr ji te re anî, de ka bihêle mêrê min ji min hez bike!

Şêx jê dipirse jina delal tu pir zîrekî; ka ji min re bibêje te çawa karibû vî porî ji wî şêrê har bîne?


Jinkê guliyên çîroka xwe jê re veçirand.

Wê hingê şêx lê nerî û jê re got: Xanima ciwan, min ji te re got tu zîrekî gelo zilamê te ji wî şêrî hartir e ko tu nikarî xwe têke kirasê wî de?

Here rîya dilê wî nas bike, bizanîn birçîbûna wî têr bike.

pirtûkên nû

Pirtûka "AYNÛR ARAS" a bi navê "XEMLA RONDIKAN" ji aliyê "WEŞANÊN AR"ê ve hat weşandin...



Aynûr Aras wek navê pirtûka xwe, helbestên xwe; bi hest û rengê jinê, bi têgihîştinek têr û tije, û bi nêrînek têkoşer; êş, bêrîkirin û hesreta gelên ku bi salane, ji welatê xwe, ji gelê xwe dûr, wek xemlên rondikan yek bi yek hûnandiye...

Bi xebata Aynûr Aras nivîskarên jin ên Kurd kesek din tevî refên xwe kir. Dê niha ji her rojê zêdetir dengê wan bilintir bibe...

Û em di wê baweriyê de ne ku; dê birêz Aynûr Aras ne tenê di warê helbestê de, di beşên wêjeyê yên din de jî valahiya ku heye bi qasî hêza xwe dagire... Em li benda berhemên wê yên nû ne...

Li ser xêrê be... Û serkeftin.

wesanenar@hotmail.com

Ewa roja baranî



Kurteçîrokek destpêbûyî ji serpehatineka dengbêj Mella Neqdelî Baxçixî

Nivîskar : Yehva Elewîferd (Emû Elewî)

Sibê zû pêş helatina rojê divê ku ez biçûma. Esman bê ewr bû, lê li wî piştgirtin nehatîye. Heta êvarê çend rengan haliş dike. Amade bûm ku biçim Qereçayê. Min hesp ji telwê derxistin û sebedên bital li ser pišta hespê mehkem kirin û sa kirîna tirîyan bi rê ketim. Gepa diya min hate bîra min ku digot: "tu nananîya mala me yî"

Wê rast digot; çima ku bavê min kal bûbû û nikaribû rêya 8 kîlometrî biçe û vegere.

Bavê min hertim li pêşa dukanê li ser kursiyekê rûdinişt û mêwe difiro.

Hinek caran jî bi hevalên xwe yê berê ra li dora hev berhev dibûn û ji gelek tiştan qise dikirin; ji ciwanî ji mirovtî û ji serpehatinên tahl û şêrîn. Kurt kurmançî, eva karê wan yê her roj bû. Lêbelê mirov nizanîbû ku gelek gepên wan rast in an na. Lê nikarîye û hezar pirs û şaşî ...

Min hesp ber bi derî va ajotin. Ewan bi dû hev re bi rêzek ji hewlîyê derketin. Sa hespan ku ser li jêr in derketin ji derî piçûk asa ye. Çima ku kurtîya derî her ser li jûrekî ser li jêr dike.

Gelek ji rê çûbûm. Ronahî dihate dîtîn. Lekeyên ewran hêdî hêdî ji aliyê rojavayê xwe bi zik dikişandin nava dilê esmîn.

Mîna her tim rê mirov diwestand ; xas ku divê ez li wegeryanê ji hespê dakevim û bi dû wan re bi lingan bêbim.

Li vegeryanê esman tijî ewr bûbû û hertim mumkin e ew bibare. Ji eva ku baran bê û neke li ber baranê şil bibim min leza xwe zêde kir ; lê karê ku gerek nebûya.

Min yekemîn dilopên baranê li ser serî xwe hîs kir. Min leza xwe dîsa zêde kir ku zû xwe bigihînim newalê Xuşkezawê. Heta ku lehî bi rê neketîye ez wî zimanga red bikim. Hinekî ku bi pêş de çûm xicawa hûrrehûrra baranê bêdengîya rê işkinandibû. Bîhna xwelîya şilbûyî û bîhna hişînyan tevlihev bûbû û dilê mirov dixilxiland. Ez gihîşibûm nêzikê kelê xwe Baxçixê. Li bin baranê bûbûm mîna mişkekî ji avê kişandî. Ji dûr li derê kelê min bavê xwe dît ku mişemmayek kişandibû ser serî xwe ku şil nebe. Ewa pîrr nagiran dihate nihêrînê. Hertim bi çavan li rê dinêhirî. Wexta ku wî ez dît ber bi min hat û bi xicawek bilind got:

Tu li ku yî kurê min? Te ku em birin ber mirinê.

Bi carekê bi heyranî li min nihêrî û got:

Kincên te li ku ye? Yanê çi? Neke dizan bi ser te re girtiye? Hinge got: Kurê min te biçe mal ku diya te pîrr dilnegîran e. Tu biçe, ez ê hespan bînim.

Ez li pêşiyê diçûm û dengê bavê min ji paş de dihat: Ez nizanim vî kurî nezan kincên xwe li kê derî wenda kirine. Ax ku nezanî heta kîngê?

Bavê min li serê hespan bang dikir û nerahetiya xwe li ser wan dadixist. Hêdî hêdî. xicawa wî li

nava dengê ternawan wenda bû.

Diya min li kuncêkî taxê sekinîbû. Wê ji nigeranîyê destên xwe li hev dikişandin û hinek caran bi destêkî lêdixiste pišta destê xwe yê din. Pîrr bêtab bû. Bi dîtina min kenek li ser lêvan rûnişt û nefesek rehet kişand. Lê ji dîtina min pîrr heyran ma. Ji tunebûna kincê min; ewa jî di wê baranê û bahozê da. Wekî ku ji zînan dihat jêr got:

Elî cano! ez sa te bibim qurbano! Çi bûye ? kincê te li ku ye? Neke diz li te ketin?

Dayîka min xem nîne . Xwe nerahet neke. Pîrr grîng nîne.

Lê ew aram nedibû. Bi lez û bez ber bi bavê min çû û got: çima tu tiştê nabêjî? Tu dizanî çi hatîye serê kurê me? Na ku na ...

Xanima min ew qas xicaw neke. Tiştê nebûye. Biçe çend cillan bîne bila lawik neqerise.

Lêbelê hercûr bûye ev dema bi xêr çû.

Li ser sifra şivê de dê û bavên min dipirsîyan û dipirsîyan ku bizanibin çi hatiye serê min. lê min nedixwest kesek bizanibe ceryana min çi ye.

.....

Çend roj ji roja baranê derbas bûbû. Li wan çend rojan halê dê û bavê min qet baş nebûbû. Çima ku cînanan jî bîhn biribûn ser karê min û wenabûna kincê min. Halê min jî îro ne xweş e. dilê mala me girtî ye.

Li wê aliyê dukanê tiştên xwarin li ser refekî li kêleka hev birêz rûniştine. Li aliyek din du sebedên tijî tirî û mêweyên din hene û li kuncêkî jî sebedên vala li ser hev danîne. Ez li teneyên cînanan difikirim. Ez ji ewan gepan westîyame. Dengê çend mirovan ji derî dukan tê guhên min. Dîsa gepên hertimî... lêbelê hinek caran ji mangan û pezan jî qise dikin. Ez ji gepên wan ne hez dikim. Yekî ji wan ku dengê ne baş hebû li min bang kir û bêdengîya min li hev xist:

Elî ! bavê te bangî te dike. Biçe ka çi karê wî heye.

Te çi got?

Bavê te bang dike. Dibêje were mal.

Erê. Ez niha tîm.

Bi lez diçim mal. Bavê min pîrr kêfxweşe. Eva halê wî li çend rojên redbûyî yekta bû. Dibe ku li benda min bû. Ber bi min hat bi kenek xweş got:

Merheba kurê min! Min dizanîbû ku lawê min çiqes mina gulan e. Tu kurê min î û ez bi te şanazî dikim.

Lê min dinihêrim bavî xwe û min nizanîbû ku çi bûye û çi ketiye. Bavê min ez hembêz kirim:

Merheba lawê min! lê çima te bi me re negot ku çi bûye. Em bi bihîstina gepa te nerihet nedibûn.

Bavo! Çi bûye? Ez hîn nizanim çi bûye û tu çi dibêjî.

Hişê min nedikişand. Bavê min haliş bûbû. Wî baskên min givaştin û ez ber bi zînan dibirim.

Lawo! Zû biçim nava odê ku mêvan me hene.

Dema ku heyranî û xefbûna min dît got:

Hişê te li ku ye? De biçim ? Li dawîyê fêm dikî çi bûye.

Nizanim min xwe çawa gihîyand jorê. Carek min dît ku li nava odê me; Teqî li ber min helistiya û dest da min:

Silav Elîyê gul! Çawa yî mêrê ciwan?

Dawî re ber bi bavê min got:

Hacî! Hêjayîya kurê xwe bizane. Ewa mêrek delal û dilovan e.

gelek sipas Teqî cano! Eva ji kerema we ye. Fermo rûne.

Bavê ber min kir û got:

Lawikê min eva ew mêvanê me yê delal e.

Ewan rûniştibûn û gepên wan gul kiribû. Ez li kuncêkî xef rûniştibûm û min xemek pîrr mezin li ser dilê xwe hîs dikir. Çima ku min her tiştê ku rêstibû niha hatibû vereşandin. Min ku nedixwest kesek ji ceryana cillan haydar bibe; lê Teqî gişt çîrok sa dê û bavê min gotibû.

Teqî şivan e û li kelê(gundê) Uxlî dijî. Em li roja baranê bi hev re hatin nasîn. Min ewa û kerrîyê wî yê pêz li zawê Xuşkezaw ê dîtîn. Ew li ber baranê şil bûbû û kincê wî tunebû. Ewa ji serman dilerzî. Dilê min ji bo wî şewitî. Min kincê xwe da ku ew li xwe bike. Min ji wî re got:

Bila kinc yê te bin.

Li despê wî qebûl nedikir:

Tu bi xwe çi dikî li wî barana?

Xem nîne. Ez niha digihême kelê xwe. Lê, tu gerek heta êvarî li ber pêz bibî. Ewa kinca sa te re baştir e.

wî bi caracara min qebûl kir û kinc hilanî. Min fêm kir ku ewa mêrek feqîr e û bêpere ye. Min ji wî xwest ku ji wî kara sa kesekî qise neke ; lê wî niha qise kiriye. Lê wî kincê min jî pê du sebedên tirîya sa me xelat daye.

Teqî dîsa carek din despê dike ku çîroka min û xwe sa bavê min bibêje ; lê ez aram ji mal derdikevim û aram bixwe re dibêjim: merheba li kesên ku dilovanî dikin û kesek ji dilovanîya wan agahî nîne: lê ez çi?

Jêrnivîs

1.Qerçay û Baxçix û Oxli navên sê kelayan li bakûra bajarê Bucnûrdê ne.

2.Xuşkezaw navê newalê li beyna sê keleyên Qerçay û Baxçix û Oxli ye.

Neqdelî Baxçixî li sala 1939 zayînî li kelê (gund) Baxçixê hate dine. Ewa nevyê Elîxanbegê ye ku îlxanê serdar mufexxem bûye. Wî heta 30 salan ji emrê xwe beşî bûye û kulamên pîrr sa radyoya kurmançî li Xorasanê xwendîye. Wî dawî 30 salan rêya xwe haliş kir û bû melle. Ji wî pîrr gotin û nohe jî bi zimanê farsî hene. Ew li sala 1986an ji dine çû. Lavê wî bi navî Işqelî Baxçixî jî mîna wî ji baxşiyên Bakûra Xorasanê ye.

Li ser evê lînka li jêr hûn dikarin li Neqdelî Baxçixî guhdarî bikin.

<http://www.ellahmezar.ir/wp-content/uploads/2012/11/Gilûr-Mesûme-Neqdelî-Baxçixî.mn?>

Mizgîn Hesko

Mijdara2012-an



Destên pîroz

Dibêjin:

Di vî çerxî de
Dê jîyan raweste
Û dê zemîn
Têk biçe.

Dibêjin:

Û hin tiştên seyr jî dibêjin
Lê.....
Ma kanî evîn...?
Gelo...ew di guhê
Kîjan razê de
Raketî maye...?

De bila şiyar bibe

Û careke din bilive
Aşê jîyanê bigerîne
Û zemînê.....çar demsalên
Ti je kulîlk bixemilîn e.

Dibêjin:

Ma kanî Xweda ..?
Û Xweda....
Di dilê me de
Lê dide

Û dilê min

Di nav destên wî de
Destên wî
Sîwana ku min
Ji baranên ne pak
Diparêz e

Destên wî

Veqetandina ne penî û ne diyar
Ku min î pak û kedî
Ji min î qirêj û kovî
Dûr dixe.

Destên wî

Tika dikim
Ku li kembera min
Rapêçayî bi mînin
Û min....
Di asta mirovayetî de
Bi hêlin.

Boniye Cegerxwin

Rûgşa min



Rûgşa min xeyidiye

Çûye dûr
Nema guh di dî ew
Li vê nalînê
Bi sala ye dilê min dikî
Gazî
Dibêjî vegere, bese
Şêrînê

Ji çûna wê ve, ez mame
Birîndar
Zîvarî û şikestîme
Li jînê
Bi vîna wê re, ez
Bûme evîndar
Bê wê çibikim
ji nûve ji hêvînê

Da zû bibînê rêça
Nazelînê
Ka demeke dî yarê tu
Bide min
Binêre ez çi rêbazê
Li jînê

Heza min jêre bû timî
Bê hawe
Gunehî min nekiriye
Bo nûjînê
Bi hawarî derûnê min
Diqêrî

Nehêle dilê min timî
Bindî
Birîna min gelekî kûre
Zînê
Perîşanî belengazî
Para min

Evîna me çawa wê
Xwe vejînê
Ka vê carê jî em bi b'ne
Rûpîroz
Wekate, ezê bême
Şaneşînê

Stockholm .2004.08.02

Têbînî ji "Pênûsa Nû": di jimara borî de şaşiyek di helbesta "Rûgşa min" de derket, ji ber wê em lêborînê dixwazin û dubare wê diweşînin.

Lazgîn dêrûnî

lazgin60@gmail.com



ŞOX Û ŞENGÊ

Hêjaye pesnê te ez bide m yarê
Deynim li ser serê te tacek mermer
Gewrû rind û nazikî her ti şêrîn
Tim li ber çavê minî te dibînim
Sebrû qinyata minê ey dîlberê
Afîtabê mahîtabê rewşenê
Şoxû şengê sazû tembûra minê
Pir şêrînê bihiştî warê minê
Şev û rojan ji bo te ez narazim
Dizanim kû qelen gelek bihayê

ji ter bînim kirasek ji biharê
serî hilde li cîhanê ti fener
tim evîndarê teme ez bûme dîn
ristû helbesta li ser te dixwînim
zor ciwanê pir bihayê gewherê
ronî didê tev ji xala gerdênê
şadû sema nayû bilûra minê
ji bo te tev xebatû karê minê
bendewarê teme ez te bixwazim
ne poşmani m zûve ew xwîn me daye

CELAL MUHEMED EMÎN



Min dil hebû

lê li min bibihur gulê
 derd û jana vî hinavî
 di fincanê de na hilê
 min dil hebû peyv bi peyv
 ez rêz bikim
 min dil hebû wan mijankan
 bê sedem hembêz bikim
 min dil hebû
 hêviya dil ji bo te bêhêz bikim
 lê dê çi kim?
 Hembêz û peyv û nevênî
 di fincanêde nahilê
 hindiya sor û perî
 min dil hebû
 pêl bi pêl derya ku rabû
 Şev bixwe porê te bû
 min dil hebû
 ez rohnîyê bidime mehê
 ji wê çirûska hêviyan
 Şebnema wan hindiyên
 tariye porê te
 li bin gul vebûn
 ew çirûska hêviyê
 ji bê hêviyan re
 di fincanêde na hilê
 min dil hebû
 bo xwe û te
 avahiyek bê bend û best
 min dil hebû
 avahiyek mîna ku
 canê te dixwest
 lê dê çi kim?
 Şahî û tenahî û rest
 di fincanêde nahilê

HIN KEVAL

-1-
 ez li meyxana du lêvên te keçê nîv meyerim
 ez li çavên te dinêrim li nîvê xwe yê dî digirim
 -2-
 postnişînim ez li mihraba kenê te
 lê li ber wan her dû lêvan gawirim
 -3-
 ev çî zindanin di çavên te de azadiyê belav dikin
 -4-
 min karîbû ji lîlavan
 bizotên agir biafiranda
 lê min nikaribû bi mirinekê û deh birînan
 hêsirek te bianiya xwar
 -5-
 ev heşt salin ez gora evîna xwe dikolim
 ev sê salin
 ez li ser evîna xwe didim girî
 ev bûye saleke evîna min can daye
 -6-
 heyvperestim ez
 li kuncê dergê çavên te me
 postnişînê xala laşim
 parek peravên te me
 parek ji lêvên te me
 ez pêlewani m li jînê
 lê li ber te bê perim
 ez dilopa xwînekê me
 di laşê te de digirim
 -7-
 Sîmava min
 çax û dem ku radiwetin
 herdu çavê min biwestin
 sebr û aramek tenê
 agirê min aşdike
 ku mijankên te
 dilê te
 her dû çavên te kenê te
 tevde ristin
 tevde ristin
 tevde ristin
 8-
 min xwest ji havîna çavên te tevneke
 ku min serma biyaniyê biparêze .birêsim
 lê çavên te ji bilî tazîbûnê belavnakin

F Yakoub



Ger

Kengî li min dibe bihar ?
 Kulîlka baxê ...minê
 Kengî li min roj tê der ?
 Havîn û teboxa ...minê
 Ev emir wa dibihûre
 Qonaxa jiyana minê
 Gotin di dila ew pir in
 Hemî nayên gotinnê
 Ger dinya yek tax be
 Tu alî û taxa minnê
 Kitan û ermûş ger hebin
 Tu kemxa Şama minê
 Find û çira ger hebin
 Tu çira û ocaxa minê
 Rind û bedew ger hebin
 Tu qeşeng û qozaxa minê
 Behîştên dûr ne ji bo min in
 Tu behîşt û axa minê
 Min reng bike ji rengê rojê
 Tu gewr û debaxa minê
 Takên dara ew jî pir in
 Tu şaxê dargula minê
 Kengî evîn azad dibe ?
 Tu çaxê evîna minê

Ezîz Xemcivîn

Stema xwînmiy

Bi dilê te re çavê kesera min şiyar e!
 Dema bi bi hna te, bi hna xwe dikişîne.
 Rewanê te li xwe dike,
 tîpên zêrîn ji ramanên te dicivîne!
 Weye, li nav germiyan ji te şermîn e.
 Bêzar di be,
 nikare dema evîniyê
 raz bi raz li rojgarê binexişîne.
 Sewdayê vekirî,
 hogiriya wî dilî
 fena giyasêvka ciwan li deşta rastiye bîn dike...
 Gava diniviste*
 li nav xêz û rêzên dûr û nêzîng
 deryake kûr ji windabûnê diwênîne...*
 Neynika gewr û ronî
 xebînetê ciwaniyê li ber bayê matmayîne wêran bimîne!
 Neynika dilsar
 kelkelên bîranîna ewrên giran bilavêtî dikin...
 Havînên xewnan ziwa ne,
 çikûsiya xwe diyar dikin!
 Dilo bo çî xela li bajarokên te radi be?
 Bo çî qirçîtikên kenê te*
 li ser xweziyan raxistî dimînin?
 Bo çî felekê,
 tu mîna keramper kiriyî. *
 Li ber pehînen tolaziyê bi bayê sermest hildibî?
 Dema tu şîrmij bûyî,
 xewnên geşbîniya xwezayê
 li ser payebilindiya dilê te ava dibûn.



Te dikarî bû
 ji hemû çeman re hewî bi bî;
 te dikarî bû, dest li ber xwe ragire
 û te dikarî bû tavên raketî,
 ji nivêjên xwe re şiyar bikî!
 Ev şoreşa te bû,
 peyam ji hinava te gurr dibûn.
 Dizanim av, ba û roj dîrî te ne.
 Hêlîna bê kilît û pencere
 sîmbola koletiya bilbilê dilê te ye!
 Dizanim sîkên rojhilat
 ji bazarên çewt kirî û firotana canên pak re vekirî nel!
 Bibûrîne,
 pênuş bê tore
 kul û derdên warhêlan tevdi de.
 Hinav dikelin,
 Demjimêr dijmina evîndaran di be!
 Bêdadiya demê dijî rêdanan
 li asoya hunerbaziya dildariyê ewran vedigire!
 Dixwaze
 mirovantiya gog,
 ji ber pêyên sitemê rake.
 Jiyan temenek e
 delîveyê bi bire.*
 bila tev de bêhûde û sernixûz neçe! *
 Toltajiyên koça serdema şîne*
 kar û barê xwe bikin;
 Şahîne azadiyê
 li asîmanê hiş difire;
 Hovîtiya stema xwînmiy navkutkê dike,
 û bi dilekî xemgîn xwe li newalên bêbinî diveşêre.

Lewend Dalînî

EHMEDÊ XANÎ

"Li ser daxwaza gelek dostên ku evîndarê Ehmedê Xanî û
 helbesta klasîkî ne, ez vê helbestê dubare belav dikim".
 Ey Suxteyê jar û reben çima wilo mestaneyê!
 Li pêşberî Mîrê mezin sertewandî bi şermeyê!
 L'Zanîngeh û Hicrên Mela; xwendî te "ÎLM Ê" Mîm û La
 Rûnanî tû l' Birc û Sera; li ber dîwara şerpezeyê!

(1)

Ez di "NEZMÊ" de çî deynim ew bi sistî û kêmtî ye
 Kû di pesnê de çî bêjim ne bûhayê XANÎ ye
 Zar û Ferhenga m'qelse şermedar na peyivî
 Xameya min jî nikrî pêş te qet ew bilivî



(2)

Elfeba min nakê pîvan navê giran EHMEDÎ
 Gotinê pîvanê çêkî bo te Seyda sermedî

Navê te li nêk Kurd bilin de giştî ber textê Mûbîn!
 Ew dijî nêw wan bi rengê "NÛBÛHARÊ" û "MEM Û ZÎN"

Sêsedê sala qedabû tevna warê me te rist
 Lê mixabin her me hûnî xav dihatî yan jî sist!

Ew çiyayê çanda asê Rê kola j' mer pêpelok
 Hîn di gava yekemîn de dikne pîkol wek pepûk!

Ez di MIHRABA te Mîrî tême sucdê gav bi gav
 Pê hewesa xwe dibînim her dibûrîn çax û gav

(3)

Ger bi sohtim laş seranser peş te nadî ronîyek
Lê di wan Baxên te çandin belkî bibme çuqlîyek!

Milletim va dîsa dijmin ted gerînê Çerx û Aş
Tanî kengî jêre Aş bî ew li dergêh te Qeraş!

Sed gelên wek me bi cihbûn bêxwedî em tenha man
Kevr û ber tevda biribûn carekê em neghane dam

Tim li cenga rojhilatê Em dibin Nîşan û Kêl
Rast û çep wêran dibin Em şar û gund û Mal û Êl!

Arê xasûma me gurr bû me nema yek ITÎFAQ!
Dest bi dest êş dabû canî laş wezakir çerim û laq

Bû birînek kûr di dil de ketbû nêva wî pereng
Min dixwest Ez wê veşêrim kêferat bimirê bê deng!

(4)

Xwîna dil rijîbû Xakê! Lê carkê din wê derbê der!
Wê bi rengê sing û pîjan çavê dijmin bînê der!

Dest bidin hev bibne banî doza Xanî a jimêj
Ber bibêt ferzek xwedanî rengê Parêz û Nimêj!

Wek Bahoz û Berq û Bayê bidne dîv wê bermedin
Ma ne şerme tanî îro rênçberê tim bê kedin

Av bidin Xakê seranser tim bi xwîna germ û sor
Qada xwe em pê cudakin Sênc û Bendan bidne dor

Kuştin û talanîya hev kû bibin ew bome doz
Xweş bi bawer bin kû dîsa dê bidin pey Kerê boz!

Pirr wekî Min Ew di vê Rê mane dil jan û geda
Bû sedem kû hîn b'jiwanî rih ji Canê m bû cuda!]

Yehya Elewîferd (Emû Elewî)

PÊNG HELBEST



1

MASÎ

Li deryayê masîyek
Ji avî westîyabû
Digot : "çişes hez dike
Her Kî ji wî ava çû

Derya tijî masî ne
Masîyên pirr mezin
Ew dikujin masîyan
Ew dixwazin cane min"

Masî bi lez rabû çû
Ji nav avê xwe derxist
Li ber xwe da li erdê
Balêne wî bûne sist

Aram li deryê bang kir:
"Li min temaş ke derya"
Derya aram ber bi hat

2

PIRR CARAN

Pirr caran ketî
Ji ser difalan
Li ortî çalan
Li cem hevalan
Bixwe verketî
Ji cem hevalan
Ji ber difalan
Ji beyna çalan

Dîsa raketî
Li dîzê çalan
Li cem hevalan
Li ser difalan

3

HÎLLÎ

Weqes li xwe nefkir
Te hîllî westandin
Te xwe brîndar kir
Cilê xwe dirrandin

Demek li xwe bifkir
Li hîllîyên çavan
Li çavên xwenga xwe
Li çavên dê û bavan

Bibîn li çavên van
Te çawa rûniştî
Bibîn li mala xwe
Mina Kîjan tiştî

4

NÊÇÎR

Qenarî û bilbilan
Dûr in li me napirdin
Qefes dîne li malan
Ji nav malan ditirsin

Hemû mêşan temaş kin
Ku hez dikin ji laşan
Qefes sa me çi kirin
Ji torran û qumaşan

Lê hûn çi ma dixwazin
Qenarîyan hîsîr kin
Bilbilan azad bikin
Werin mêşan nêçîr kin

5

QEFES

Min zû qefes vekir gotim:
"Bilbila min halist bifir"
Ew çû li kuncêkî rûnişt
Ber bi derî temaş nekir

Ez li karî bilbilê mam
Revî m û çûm cem bavî xwe
Gotim: "bavo karek haka
Min îro dît bi çavî xwe"

Demek fakir kir bavî min
Got: "vî kara ji bîr neke
Bilbila te bûye hîsîr
Xwe mina wî hîsîr neke"

Ezê ji xwe biparêzi m
Gepê bavê ji bîr nekim
Bi hebsê adet nekim û
Xwe bilbilek hîsîr nekim



Hêviya zuha

Jî kirin du tar(parçe).. lê soza dawî bi gotina bê kirin.. kaniyên hêviyê zuha kirin û em polî poşman vegeyriyan.

Bi keştiyê em avêtin paş dîwar, nuh min nas kir ku ew navên me şayist û ne derew bûn, wêjevan û mîdyakar û rewşenbîrên şevên tarî emîn..û lehegên nepen di tariya demê de emîn.

Ezê li çar nîkarên te bigerim û biqûrim welato.., bila hêvî zuha bimîne..lê tîpên hêviyê (H.Ê.V.Î) wê her û her ji sersar û nankoran bi gazinc bin,çiku ew berjewendiyên xwe diparêzin û pirojeyên kesane ji xwe re pêk tînin, li Hewlêr û Silêmaniyê..bi cîh bûne.. wan çî ji meye?!

Mezopotamya

Bi derketina hûriyan re êdî her çend hêze babiliyan mazin hebe û serdest ji bin weke asuryan zêde wilo serwerî hemûkî nabin.

Lê ji aliyê çandî û hizrî ve ew hertimî serdestin. Ew kifşdikin. Ji aliyê olî ve ji wilo ya.

Bi ketina xanadana Ur e sêyamîn re, êdî li bakûr Asur hêdî hêdî cih tişî dikin û li başûr babil derikevina pêş. Babil êdî li vir derdikeve pêş. Hûrî, di wê demê de, ew hêze wan ya ku zayîf bûyî, careke dî dibe û mazin dibe û serwer dibe. Bi derketina hûriyan re êdî her çend hêze babiliyan mazin hebe û serdest ji bin weke asuryan zêde wilo serwerî hemûkî nabin. Di wê demê de hê asur ne bi hêzên. Lê hin bi hin bi hêz di bin. Hurî û mîtanê hin bi hin mazin di bin ta sadsala 13. Ji hêze xwe û serdestiya xwe ya li ser herême di domênin. Şer di van deman de pir çêdibin. Asur ji bi hêz di bin. Êdî di nav wan hêzan de şerê serdetiyê berdewam dîke. Piştî sadsala 13 wan êdî hin bi hin nâri derdikevin. Ew ji serdestiya wan û weke wan berdewam dikin. Ta deme 800 wan ew ji serdestin. Pêşketina mazin bi çandî û teknolojîkî bi wan re heya. Piştî Asurî dawiyê li serdestiya wan tînin. Lê ew dise li berxwe didin. Ew li berxwedan, nêzîkî di sadsalî ta deme Medan berdewam dikê. Medan bi şerkiirna bi asuran re û têkbirina wan re serdesti bidest xistin.

Jêder Wîkîpediya,(orcînala gotarê tê weşandin)

NAMEYA BI TIRKÎ Û LEŞKERÊ ROMÊ

Ev bêhtir li ecêba pîra Îmmê diçû. Her digot ev di nameya berê de jî hebûn. Ne şandina dîmane ew bêhtir xemgîn kiribû. Pîrê dîsa ew name hilgirtibû û di ser û çavê xwe dabû û maç dikir. Di dawîkê de, ew name jî xistibû nav naylonêkî tenik û xistibû paşila xwe. Û bi her kesê ku bi tirkî dizanî bû dida xwendin.

Piştî çavlirebûna bi rojan, pîra Îmmê dîsa pêrgî nameyeke neviyê xwe Dewrêş hatibû. Dîsa heman kelecana û şadîmanî. Gava wê dîmenê Dewrêş jî dîtibû bêhtir şad bûbû. Neku bi dîtina dîmen, bi wî dîmenî bawerkir ku Dewrêş hê li jiyane ye.

Lê gava bala xwe dabû dîmen veciniqî bû. Ew dîmenê leşkerê romê yê mal û gundê wan talankiribûn bû. Wî dîmenê bîranîni û kulê wê tevrakiribûn. Di wan şevên tarî de. Di wê seqem û sermayê de, yê xewa şîrîn û xewnên şîrîn ji ser wan biribûn. Û mirin, talan, kuştin û nefî bi xwe re anîbûn. Hin ji xizmên wê bûbûn firarê romê, û bi bin xetê û bi anadolê ve pekiyabûn. Hin jî bê kêlî û delîl çûbûn ji wî diyarî. Ew leşkerbûn, ku bi êş û kuştina gundî û xizmên wê şa bûbûn. Ew leşkerê ku malbata wê qirkiribûn. Ew leşkerê ku qesasê bav û brayê wê bûn. Lê wê bawer nedikir ku rojekê kurê wê jî, bi wî kirasî derkeve pêşberî wê. Yê di nav wan kincana de, dil û kezeba wê bû. Ew Dewrêşê wê bû. Lê gava bala xwe dabû çavê Dewrêş, wê di çavê Dewrêş de, êş û jan dîtibû. Têgihişt ku kurê wê ne şad e. Û tevî êş û kulê jiyane weke bêje; Ez ji we hez dikim! Ez kurê te me dayê. Wê rojekê ezê bêm û bibim mêvanê te. Çi bi saxî çî bi mirîti dayê. Wê dîmenê Dewrêş, tevî nameyê xiste nav wî kîsikê naylon û xiste paşila xwe û bi dilê xwe ve guvaşt. Ew cara yekem bû, ku dayika Îmmê ji leşkerekî romê hez dikir. Pîra Îmmê berê xwe dabû malê û ji xwe re kûhr kûhr diponijî. Û dîsa ew dîmenên berê û yê nû dihat ber çavê wê. Û stranê xerîbî û zelûliyê, di ber xwe de di lûbandin..

Biratiya kurdan qediya

em birayên hev in, nema zikê wan li ser hev diêşe.

Kurd ana wek hemû mîletên cîhanê li gor berjewendiyên xwe diçin, eger ne wiha ba Erdogan di hilbijartinan de li herêmên kurdan bi ser nediket. Rabû me wiha nivîsand

01 -“Vê sibehê zû wek ku Marek bi min vede ji xew veciniqîm û şiyar bûm, min ji xwe re got: xwedê xêr bike, min di xew de dîtibû: bi tonan nanê germ ji Niseêbinê di gha Qamişlo..me digot: ha biratî ev e ha..”

02 -“Eger birayên me li bakur nikaribin nanê germ bighînin Serê Kanyê, bila li dijî çeteyên Erdogan ên li Serê Kanyê helwesta xwe eşkere bikin...an nebêjin em birayên hev in..”

03 -“Eger Serê Kanyê Geza ba û gawiran wiha pê bikra, wê kurdên bakur rabûna ser pêyan..wek ku berê ji bo Geza rabibûn û xwe hejandin..lê ji bo Serê Kanyê ku bajarekî kurd e deng ji miriyan tê lê ji wan nayê...sed heyf û mi xabin...”

04 -“Gelek spas ji bo kurdên bakur ku dikarîbûn di xewnan de alîkariya me kurdên Rojava bikin û nanê germ bighînin ber destê zarokên me yê birçî...”

Me bi riya rûpela xwe ya facebookê ew çar xal gihandin birayên bakur, daku di rojên mirinê de xwedî li birayên xwe –eger hîna biratî mabe- derkevin...

Piştî ewan her çar gilî û gazinan, bersiv ji bakur wiha hat, çima em dibêjin ji bakur? Ji ber nivîskarekî Şernexî ew bar avêtibû ser xwe, nivîskar û edîtorê kovarên “Zarokan” wiha bersiva me da: “Hinek kesên ji Binxetê hene ku kûçik jî goştê wan naxwin! Li welatên Ewropa li quzilqurtê ne û araç û şerab û mîza zarokên Binxetê vedixwin û bi wê serxweşiyê berê xwe didin welatê xwe yê bi navê "Facebookkurdistan" û dev davêje Bakur û başûr û Rohilat û Rojava! Hela berê jahrê belav bikin û g... bixwin werin welatê xwe wekî şêran şer bikin û piştî gotinê "Şêrîn" bikin! Êdî bes e yahû wele ker bi kertiya xwe bi "we" û "Şêrîn"tiya we dikenin, lê "we" bi qasî keran jî hay ji "Şêrîn"tiya xwe nîn e!!!”

De werin û kirasê xwe neçirînin, em çî dibêjin û tembûra me çî dibêje, em gilî û gazin û hewara xwe dibin birayên xwe, nivîskarê me wiha bersivê dide. Ha ji biratiya kurdan ew nimûne maye, ê keko tu nikarî alîkariyê bikî, bê deng be. De werin û li vê asta ketî û nizim vegeyriyan. Tenê jê dixwazim ku hiş û ramanên xwe azad bike daku wek mirov bi jî..... www.qadoserin.com

MÎŞÊL FÛKO

Wergera ji Frensî bo Rûsî : **Égor Gorodtski**

Werger û amedekirin ji Rûsî : **Bêkes Têlo**

*Bi vê deqê , Fûko di simînarekê de li ser masa girover ku mijara wê ser Nîtsşê bû bejdar bûbû.Pey re deqa gotûbêjê tê pêşkirin.

*"aemulatio"peyvek latîni ye bi wateya teqlîdkirin.

*J.Port:berhmdarê „sihra xweza yê,,û „sîmaya rûwê mirov,,di sedsala 17 dijya.Fûko pir caran wî weke palgeh digre ,bi taybetî di pirtûka xwe de „peyv û tiştan,,

*Têbînî. Ji ber dirêjbûna deq û gotûbêjê min hewl da bi givaştin û xalên herî berz bo xwêner ê hêja pêşkêş bikim.

* sîmiyotîka: peyvek Grîkî ye(sîmalogia:sîma bi wateya îşaret(kod) û logia bi wateya zanyarî.Bi kurdî hêsan e em bêjin sîmiyotîka an jî,sîmiyolojî.Zanyara li ser kodan e û lêkolîna jiyana wan di civakê de.Me ferî wergirtina tiştên veşartî û temirî ji paş pey van dîke.

dawleta "Serê kaniyê"

ku hêza PYD wek hêzeke Rojavayê Kurdistanê, biçûk bixin, ne jî mafê „Kurdîstana Sûrya B“ heye, ku xwe bi PYD li ser Kurdên deverê (bi taybetî Kurdên Rojava) mezin bikin, û herweha şaşiyên bi şaşiyên, û probleman bi probleman, sererast bikin.

„Dewleta Serê Kaniyê“ ji bo Kurdên Rojava bi taybetî û Kurdên aliyên din yê Kurdistanê bi giştî, ne tenê derseke mezin, belê şensekî mezin bû jî; ne tenê ezmûneyeke mezin, belê serkeftineke mezin bû jî; ne tenê siyaseteke mezin, belê dîrokeke mezin, çandê mezin, hestkirina bi hebûneke mezin û herweha destpêka rastiyeke bi Kurdî mezin bû jî.

Wek tê gotin: „panava hezargavî, bi gavekê dest pê dîke“.

„Dewleta Serê Kaniyê“ jî, bi ya min, gavek ji hezar gavî ber bi „Rojavayê Kurdistanê“ ve ye.

Pirsa ku dimîne ev e:

Aya Kurdên Rojava; bi hemî siyaset, îdeolojî û lêvegerên xwe ve, dê heta kîjan redevê, yan jî heta kîjan aqilî, bikaribin „Serê Kaniyê“ ji Kurdistanê heta bi Kurdistanê, di xwîna xwe de, spêya, li ser pêyan bihêl in?

Sernivîser

Qado Şêrîn

Rêvebirê Nivîsînê

Arşek Paravî

Desteya birêvebir

Abdilbaqî Huseynî

Ezîz Xemcivîn

Lawîn Şêxo

Pîr Rustem

Silêman Azer

Derhener

Xorşîd Şûzî

Ji bo hinartina berhe mên kurdi:
kurdi.penusanu@gmail.com



**F
R
E
E
D
O
M**

**F
R
E
E
D
O
M**



**A
Z
A
D
Î**

**A
Z
A
D
Î**